

Piştî Almaniyayê, Amerîkayê jî biryara qedexeya li ser PKK'ê nerm kir

## Şer gur dibe, tevger geş dibe

**L**igel gurbûna şer li Bakur û Başûr, tevgera kurd di qadên navneteweyî de jî mewziyên nû bi dest dixê. Piştî biryara dadgeha Almanya ya ku qedexeya li ser PKK'ê nerm kir, îcar Dadgeha Federal a Los Angelesê biryar da ku alîgirên PKK'ê dikarin çalakiyên xwe di çarçoweya zagonên Amerîkayê de bimeşînin. Li aliyê din dozên li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê li dijî Tirkîyeyê vedibin, wê dewletê tengav dikan. Serokê Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê Michale Salvia da da zanîn ku dema Tirkîye sûcê xwe dubare bike ew dê jî helwesta xwe tûjtir bikin.



Hunermend Aram Tîgran:

**Rihê mûzîka**

**kurdî**

**xira nekin!**




Jînenîgarî: Huner û jiyani Hesên zîrek - Rûpel 4

Bîranîn: Heval bavê min! - Rûpel 6

Wêje: Nivîsarî divê bibe pîşe - Rûpel 10

Nûçe: Keyna kurd û vilika Kurdistanî Sema Yüce, bî tewrê qelfê şehîdan - Rûpel 15

## Azadiya WELAT



SAMI TAN

Tiştê balkêş gotinên hêzên dewletê yê li ser zimanên kurdî bûn. Ew gotin han didin ku, em xebata xwe gur bikin. Li gorî hêzên dagirkeran ji bilî zimanê tirkî tu ziman nîn e.

## Xwediyê doza neheq kevir li gûzeka xwe dixwe

Van rojên dawîn di vî quncikî de bi giranî li ser pêşveçûnên di rojnameyê de tê rawestandin. Tevî ku di vî warî de bûyerên girîng hene, em dixwazin pêşî li ser bûyerên di rojevê de rawestin.

Şer bi hemû gurehiya xwe li Başûr û Bakur didome. Medyaya tirk ji ber ku artêşa tirk di şer de çu encamê bi dest naxe êdî wekî berê reklama operasyonan nake. Li aliyê din li derve û hundir bûyerên ku dewletê tengezer dikin diqewimin. Piştî Ewrûpayê, kêşeya kurdî ketiye rojeva welatên din jî. Di vî warî de êdî dewleta tirk û Amerîka jî li hev nakin. Hewlên dewleta tirk ên tecrîtkirina tevgera azadîxwaz di avê de diçin, navê terorîstiyê ku dagirkeran bi pey tevgera azadîxwaz xistibû, dibe toq dikeve stûyê wan. Bi vî yekê re dagirker zêdetir ji rê derdikevin, hemû pîvanên mafên mirovan datînin aliyekî, berî didin kuştin û girtinan. Piştî rewşenbîrên

mîna Haluk Gerger, İsmail Beşikçi, Saruhan Oluç, Edip Polat, İcar jî rojnameger Ragıp Duran hate girtin. Çapemeniya navneteweyî de ev nirxandina di cih da kir: "Dewleta tirk kevir li gûzeka xwe dixwe."

Digel van rûdanan, gavên ku di warê pêşxistina rojnameyê tî avêtin me bêgav dikin ku em çêlî wan bikin. Dibe ku hin ji bo me jî bibêjin, "12 çîrokên hirçê hene, giş jî li ser hirmiyê ne", lê dîsa jî her wekî li jor jî hate daxuyandin, nirxandina van pêşveçûnan jî bi qasî bûyerên din girîng e. Jixwe taybetiya vî quncikî jî ev e ku li ser rojnameyê xwendevanan agahdar bike.

Hefteya çûyî roja yekşemê li Mêrsînê nûnergeha me ya yekemîn vebû, her wekî di rûpeşa 16'an a rojnameyê de jî hatiye diyarkirin, nûnergeh bi awayekî girseyî û çoşeke mezin vebû. Beramberî vî yekê neyarên geşedana doza azadiyê jî destvala neman û xwestin li ber vî

geşedane bibin asteng, lê di vî warî de bi ser neketin.

Li ser vî yekê piştî vekirinê bi rojekê hevalê me Seyit Karabaş girtin binçav, piştî heqaret û lêdanê ew berdan. Tiştê balkêş gotinên hêzên dewletê yê li ser zimanên kurdî bûn. Ew gotin han didin ku em xebata xwe gur bikin. Li gorî hêzên dagirkeran ji bilî zimanê tirkî tu ziman nîn e, li vî erdnîgariyê, lê dema hevalê me rojname dirêjî wan kir û got: "Heke tu ziman nîn e, kerem bike vî nivîsê bixwîne." Gelekî şeqizî û dest avêtin rêbazên hovane. Bi vî yekê jî dan zanîn ku ew di gotin û kirinên xwe de ji vir heta mala Xwedê neheq in. Doza neheq tu car nikare bi ser bikeve. Jixwe li hemberî gelê mêjî-azad tu şansê wê dozê nîn e.

**Nişe:** Roja 25'ê pûşperê serê sibê li DGM'ya Stenbolê doza ku li rojnameya me hatibû vekirin, dest pê dike. Em hemû xwendevanên xwe vedixwînin wir.

## Gelê kurd di merhaleya serhiladanên nû de ye

FERHAT AMEDÎ

Komara çeteyan, careke din bi armanca dagirkirina başûrê Kurdistanê, hêzên xwe yê leşkerî û hevkarên xwe ajotin ser gerilayên Tevgera Azadiyê. Di pêvajoya van xwecirandinên bi qirêj de ya herî berfireh û pîralî ya 14'ê gulana 1997'an, bû destpêka mejûya vî operasyonê. Ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hate kifşkirin ku ev, 55. salvegera avakirina dewleta Îsraîl bû: Ev operasyon ne bi tenê operasyoneke leşkerî bû. Di gel vî yekê aliyên siyasî, diplomatîk û legal jî hebûn. Armanca împeryalist-siyonîst û Kemalîstan li Başûr, avakirina Îsraîleke nû û li Bakur jî li ser îmhakirina Tevgera Azadiyê çareserkerineke sexte û çeteyî bû.

Bi vî armanca gelek civîn û hewldan çêbûn. Sala par di van deman de civînek li Ewrûpayê hate lidarxistin. Di vî civînê de gelek kesan cihê xwe girt; mîna nûnerên dewleta tirk, reformîstên kurd, îxanetkar û hevkarên wan. Dîsa di qada legal de jî xebitîn û ji xwe re hinek hevkar derxistin. Hewldanên wan jî çêbûn. Armanca wan îlankirina eniyêke îxanetkar û xwefiroş bû. Lê ev yek hate deşifrekirin û piştî gelek derbeyên xedar artêşa tirk jî, bi paş ve kişiya û ev plan bi avê de çû. Lê dev jê bernedan. Di bin re hûrik hûrik xebitîn heta îsal.

Piştî qewirandina Ş. Sakikê îxanetkar, careke din ev plan germ kirin û xistin rojevê. Di serî de di gel şerekî

psîkolojîk, ku heya îro nehatibû dîtin, bi operasyonên leşkerî dest pê kirin.

Li Botanê bi deh hezaran leşker, cerdevan û tîmên taybet ajotin ser gerilayên azadiyê. Lê tiştê bi dest nexistin. Bi rêveberiya 24 generalên faşîst operasyoneke ku heya îro nehatibû dîtin li Amedê dest pê kir. Lê ew jî bi tewşê de çû. Berê xwe dane Dêrsim û Mêrdînê. Di dawiyê de careke din ketin Başûr. Ev operasyona nû, hebek ji operasyonên dinê ye. Lê ji wan fi-

**Niha li ser navê çareseriyê, dagirkirina kurdan tînin holê. Di bin rengê reform û gavavêtinên sexte de, pişavtin û komkujiya kurdan heye. Ji ber vî yekê her çiqas "Heft caran çûbin Seferê jî dîsa ew kere berê" ne.**

rehtir û qirêjtir e. Bêşik hedef ne bi tenê gelê kurd û Tevgera Azadiyê ye. Hemû gelên Rojhilata Navîn li hemberî êrişek bêsinor in.

Dîsa ev operasyona ku ji aliyê her sê hêzên neyarên mirovahiyê ve hatiye amadekirin, bi tenê ji aliyê leşkerî ve nameşe.

Vî carê pêgeha xwe firehtir dikin. Ji bilî PDK, xayin û xwefiroşan endamên nû ji xwe re dibînin, mîna rewşenbîr û çepgirên sexte yê berdevkên çeteyan, mîna misilmanên bêdîn û partiya MHP, mîna îdeologên komara faşîst, Doğu Ergil û hwd. Plana vî ca-

rê jî ne bi tenê li ser başûrê Kurdistanê ye. Bi qasî li ser Başûr e, li ser Bakur û Rojhilata Navîn e jî.

Dixwazin li ser serkeftineke sexte li Başûr komareke bi reng û navê xwe Kurd lê bi eslê xwe çete û hevkarê faşîzma tirk ava bikin. Îsraîleke nû armanca wan e. Plana Bakur jî, bi destên kurdên xayin, faşîstên tirk û hevkarên wan, qaşo çareserkerina pîrgirêka kurd e. Li hundir, li derve û li ser gerilaya gelek hesabên komara tirk hebûn.

Lê piştî qewirandina îxanetkar, plana wan, derbeyeke mezin xwar û berî wextê xweza, ber avêt. Niha li ser navê çareseriyê, dagirkirina kurdan tînin holê. Di bin rengê reform û gavavêtinên sexte de, pişavtin û komkujiya kurdan heye. Ji ber vî yekê komara tirk û îxanetkarên kurd her çiqas "Heft caran çûbin eferê jî dîsa ew kere berê" ne.

Gelê me li dijî van êrişên biqirêj ne bêçek û parastin e. Berî her tiştî bi hezaran şervanên azadiyê her roj her saet derbeyên xedar li dijî minên gelê kurd dixin. Gelê me di merheleya serhildanên nû de ye.

Dîsa yê ku bi gur re dixwin û bi xwedî re digirin, baş hatine naskirin û eşkere bûne. Pergala ku Tevgera Azadiyê soz kiriye, wan bê nefes û jiyandî dihêle. Tev pûç dibin û tîne avêtin.

Gelê me di bin rêberiya dirûşma "Di şer de serkeftin, di jiyandî de azadî" wê van planan vala derxe û wê bi ser bikeve.

## Ferhengok

<b>ava tezi:</b> ava cemidî	nexasim
<b>aşîr:</b> meşka şîr	<b>nişandin:</b> rêzkirina tiştêkî
<b>awandin:</b> dewsandin	<b>nûrandin:</b> qatkirin (katlamak)
<b>babet:</b> mijar, mewzû	<b>nûriştin:</b> avêtin
<b>berşo:</b> şilope	<b>pêrayibûn:</b> ecibandin
<b>bestenî:</b> dondurma	<b>pinujîn:</b> pişkîn
<b>betlane:</b> tatîl	<b>pişavtin:</b> asimîle
<b>beybûn:</b> papatya	<b>pişe:</b> meslek
<b>çeng:</b> kulm, mist (avuç)	<b>ramyarî:</b> siyasî
<b>dawestîn:</b> li ser piyan sekînin	<b>rasteqîn:</b> rastîn, reel
<b>dijberî:</b> berberî,	<b>rewisîn:</b> kizirîna por û piçê
<b>fintoz:</b> jina şox û şeng	<b>rûs:</b> tazî
<b>fote:</b> çarşef	<b>sat:</b> bîsk, kêlî
<b>hildim:</b> bi tempo	<b>sexel:</b> kerîya berxan
<b>hespê sêw:</b> yalîk atî	<b>têgîn:</b> mefhûm (kavram)
<b>hîndekarî:</b> öğretim	<b>tolê:</b> jina tolaz
<b>kukûz:</b> qaşilê daran	<b>tomî:</b> yedikule oyunu
<b>lêçûn:</b> mesref	<b>wergirtin:</b> jêgirtin; lixwekirin
<b>lêniştin:</b> lêsiwarbûn	<b>xal:</b> şanik, noqte
<b>lêpêngîhatin:</b> lêrasthatin	<b>xazmadanî:</b> sarinc (buzdolabî)
<b>lêxêrveanîn:</b> şêkirandin	<b>yekta:</b> bêhempa (eşsiz)
<b>mandû:</b> tiral, zexel	
<b>mar:</b> ode; beş	
<b>nalebar:</b> nehevgerî (çelişik)	
<b>nemaze:</b> bi taybetî,	

# Şer gur dibe, tevger geş dibe

Hefteya çûyî rojev bi bûyerên cur bi cur hate dagirtin. Hêzên ARGK'ê li Bakur û Başûr çalakiyên xwe bi gurehî didomîne. Li Başûr gerîla êrişên mezin dibe ser hêzên artêşa tirk û PDK'ê di wan êrişan de bi dehan leşkerên tirk û PDK'yî hatin kuştin. Li Bakur jî li cihên mîna Şîrnex, Wan, Amed Mêrdîn, Elih, Sêrt, Sêwaz û Derşimê çalakiyên gerîla pêk hatin. Ji bilî wan hêzên gerîla avêtin ser navçeya Elbakê ya Wanê.

Li aliyê din Biryargeha Giştî ya ARGK'ê di navbera 20'ê pûşper û 20'ê fîrmehê de bazirganiya neftê ya di navbera Başûr û Bakur de qedexeyê kir. Li gorî daxuyaniya ARGK'ê PDK şerê xwe yê li dijî gerîla bi pereyên ku wekî bertîl ji bazirganî distîne, fiyansê dike. Hate gotin ku di dema qedexeyê çî kesê ku neftê bikîşîne, dê bibe hedefa êrişên gerîla. Li gorî agahiyên fermî yê dewleta tirk bi texmîni 5 hezar ton neft hatiye kişandin û tona wî bi 200 dolarî tê firotin. Li gorî heman çavkaniyan rojane 1200-1400 kamyon derbasî Başûr dibin. Tevî ku kontrola bazirganiya neftê bi giranî di destê çeteyan de ye jî, dewleta tirk ji ber ku naxwaze kesên welatparêz ji dahatûyê sûdê wergerin, lê dixêbite ku wî karî bide destê şirketa xwe ya bi navê TPAO. Tê gotin ku dê piştî vê biryara ARGK'ê bazirganiya neftê derbeke mezin bixwe.

Li nik van rûdanên ku dewleta tirk tengav dikin, li Ewropa û Amerîkayê jî biryarên ku ne bi dilê dewleta tirk in li pey hev tene girtin. Li pey biryarên Parlamentoya Ewropayê û Parlamentoya Fransayê îcar jî Dadgeha Federal Los Angelesê Amerîkayê qedexeyê li ser çalakiyên PKK'ê nermtir kir. Li gorî zagonên Amerîkayê her cure tîkîlî bi rêxistinên ku dewleta Amerîkayê wekî "tero-



rist" dike, qedexeyê bû. Kesên ku alîkariya wan rêxistinên bikirana bi 10 salan dihatin sizakirin. Lê li ser serlêdana Projeya Zagonên Mirovane, çalakiyên wan rêxistinên ên ne li derveyî zagonên Amerîkayê serbest bûn.

Serokê vî rêxistinê Ralph D. Fertig diyar kir ku ew dixwazin qedexeyê li ser rêxistinên wekî PKK û Pilingên Tamil Elam bê hilandin, dê tîkoşîna xwe di vî warî de bidomînin. Lewre li gorî dîtina wan ev rêxistin ne terorîst in, doza azadiya gelên bindest dimeşînin.

**Serokê KMME Michale De Salvia: Azadiya derbirîne mafê her kesî ye**

Sekreterê Giştî Komîsyona Mafên

Serokê KMME'ê Michale Salvia: "Mafê televîzyonê, radyoyê, bi zimanê xwe xwendin û nivîsandin û bi nasnameya xwe, xwe îfadekirin mafên bingehîn in ji bo hemû gelan. Li aliyê din kî dibe ew zane, dema zilm lê bê kirin, Pêwîst e saziyên dewletê pê re eleqedar bibin, nexwe wê berpirs dewlet be."

Mirovan a Ewropayê (KMME) Michale De Salvia hefteya borî li ser vexwendina berpirsiyarên Liseya Galatasarayê hate Tirtiyeyê. Piştî ku li dibistanê konferansê li dar xist, li ser daxwaza Baroya Stenbolê konferansê jî der barê mafên mirovan de li Navenda Perwerdehiyê ya Stajê ku girêdayî Baroya Stenbolê pêşkêş kir. Sekreterê Giştî yê KMME'ê Michale De Salvia bi giştî li ser hiqûqa bingehîn rawestiya. Digel wê yekê Sekreterê Giştî yê KMME'ê li ser mafên gelên hindikahî parastina saziyên demokratîk sekinî. Salvia, li gorî qanûnên KMME'ê diyar kir ku, pêwîst e di welatekî de mafê damezrandina saziyên demokratîk hebe.

Li gorî Salvia mafên bingehîn parastina ji îşkenceyê û mafê jiyane ye.

Li gorî Sekreterê Giştî yê KMME'ê Michale De Salvia, Komîsyona Mafên Mirovan a Ewropayê derbarê rêz û rêçikên hiqûqê (Îştîhad) xwe de jî gaveke girîng avêtiye. Ew vî yekê wiha şirove dike: "Hebûna şidetê dema bi birîneke biçûk be jî li ser laş diyar bibe, rasterast digihîje biryara îspata îşkenceyê. Ev kî dibe bila bibe. Dixwazî bila militanekî zor xeternak be jî, dîsa dema şopa îşkenceyê li ser cesedê bê dîtin em wî cesedê wekî delîl bi kar tînin." Li gorî Salvia, herçiqas hêzên ewlekariyê berpirsiyariya kuştinê di xwe de dibînin, divê bikaribin li dijî wan rêxistinên tîkîkoşin jî. Di berdeyama axaftina xwe de Sekreterê Giştî yê KMME'ê çêlî tiştên balkêş kir û wiha got: "Pêwîst e saziyên dewletê bi bûyerên kuştinan re eleqedar bibin, dema ew eleqedar nebin wê dewlet ji wê bûyerê berbersê bê dîtin."

Di dirêjahiya axaftina xwe de Sekreterê giştî li ser mafê hindikahîyan rawestiya. Wekî mafên bingehîn jî ev tişt nîşan dan: "Mafê televîzyonê, radyoyê, bi zimanê xwe xwendin û nivîsandin û bi nasnameya xwe, xwe îfadekirin."

Silvia wekî bersiva pirsên me yê li ser kêşeyê kurdî, pêpêskirina mafên wan û dubarekirina heman sûcî ev tişt gotin: "Li gelek welatan îxlalan mafên mirovan pêk tên. Lê heta niha herî zêde doz li Înglistan, Fransa, Îtalya û Tirkiyê hatine vekirin. KMME alîgirê aşî û siyaseta aşîyane ye. Di bûyerên dubare de heta niha KMME bê tevger nemaye. Ev yek jî bo Tirkiyeyê jî derbas dibe. Dema ku Tirkiyê ji du bûyerên wekî hev bê cezakirin, wê helwesta KMME'ê tûjtir be."

NAVENDA NÛÇEYAN

## Geşta rojnamegerekî ber bi Girtîgeha Sarayê...

Di sa rojnamegerek hate girtin... Piştî Işık Yurtçu rojnamegerekî din jî bo ku 7 meh û nîvan li Girtîgeha Sarayê rakeve jî aliyê me ve roja 16'ê meha pûşperê hate bi rê kirin. Em saet li dora 11'an li ber avahiya Komeleya Rojnamegeran a Tirkiyeyê civiyan. Em hemû li benda Rojnameger û Nivîskar Ragıp Duran bûn. Girsêya ku li ber Komeleyê jî rojnamegeran pêk dihat bala kêsên ku di ber Komeleyê re diçûn û dihatin dişikand, li baldarî li girseyê dinêrîn, dixwazin hîn bibin ka çî bûye. Duran, pazde bîst deqîqeyan dereng gihîşte ber komeleyê. Lê dema ku gihîşte ber komeleyê jî qiyamet rabû. Belkî em di emrê xwe de yekemîn car li artêşeke bi vî rengî rast dihatin. Belê artêşa medyayê. Gelo çima vî bûyerê hew qasî bala wan kişandibû? Adefî li ser piştê hev siwar dibûn. Çend flaş û hin tiştên din jî ber lihevsiwarbûnê şikestî. Bi rastî ne em tenê yê ku beşdarî wê torenê bûn, hemû şaş mabûn. Piştî ku Nail Güreli axivî, Duran jî axaftineke kurt kir û piştî axaftina wî em jî digel wî li otobosê siwar bûn û me da riya Girtîgeha Sarayê.

Ji wê deqîqeyê şûn de serpêhatiya rê dest pê kir. Bi rastî coşeke mezin hebû di rê de. Ji çavên Duran diyar dibû ku piştîgiriye, girtîgeh bi wî daye jibîrkirin. Demekê Ragıp Duran bi heyata ku jî saziyên kurdan pêk dihat re sohbetek kir û neheqîya ku li wî hatiye kirin bi tenê bi du hevokan şirove kir. "Yên ku diziyê dikin 4 mehan digirin, lê em..." Ligel her tiştî morala xwe tîk nedibir û digot: "Heta ku ev heval hebin ez tu carî bi tenê namînim." Digel van yekan di vî rêwitiyê de kesên ku heta niha em di çalakiyê de bi vî rengî de li wan rast nehatibûn, tevî vî rêwitiyê bûbûn.

Duran di dema rêwitiyê de bi gelek rojnameyên biyan re bi riya telefonê hevdiîtin pêk anîn. Carekê di destê wî de qaxizêke faksê û hate paşîya otobosê. Ew kaxiz rûpelek jî rojnameya Liberasiyon bû. Di rojnameyê de li ser wî nûçe hatibû nivîsin. Jixwe ew nûnerê wê rojnameyê yê Tirkiyeyê bû. Di heman demê de faksê jî Le Monde jî gihîşte destê wî, di wê rojnameyê de jî li ser wî nûçe hatibû nivîsin. Bi mebesta vî yekê ew faksên rojnameyan jî bo rojnamegerên qaşobê bû

mijara henekan. Di wan her sê çar saetên rêwitiyê de, bin biryara dadgehê qet ne hate kolandin. Ji ken û cambaziyê pêştî tiştêkî din nehate kirin. Me sedema vî helwestê merak kir û ji Ragıp Duran pirs kir. Duran jî em di wî warî de mafdar dîtin û got ku, ji avabûna komara tirk vir de tabûyek heye, ew jî kurd in. Ew naxwazin ku kurd bikevin rojevê. Artêş nahêle ku kes dest bide vî tabûyê. Her ku em nêzî girtîgehê dibûn Ragıp Duran bi hesreteke kûr li der û dora xwe dinêr. Dema em gihîştin ber girtîgehê çend rewşenbîrên ku di wê girtîgehê de bûn destên xwe jî bo me di derabeyên qowîşê re derxistin û bi du tiliyan nîşana serfraziyê kirin. Di wê demê bi rastî jî girtîgeh bi me gelekî eletewş hat. Girtîgeheke biçûk, çar hawîrdorê wê jî tîlên polat hatibûn dorpêçkirin. Jiyan kesên rewşenbîr û ronakbîr di neqeba çar diwaran de dihatê bisinorkirin. Ev jî bi gelek kesan acep dihat. Belê cihê Işık Yurtçu, Ragıp Duran ti-jî kir, gelo piştî Duran wê kî cihê wî tîji bike!

AZAD ALTUN



# Huner û jiyani Hesen Zîrek

Hesen kurî Ebdulla ye, nasnawî "Zîrek" e. Hesen dû biray hebûwe, gewrekeyan nawî "Heme Emîn" e. Diway mirdinî "Hesen"î biray hêndî pê neçû, ewîş emrî xoy kird. Biray biçûkî naw "Huseyin" e û êsta le Bokan e. Daykêyan nawî "Amîne" ye, ewîş diway Zîrek zor nejiya û mird.

Her le zuwewe bawî emrê û rencî bê-xêwkirdinî daykî dekwête estoy, belam hêndey pê naçê daykî şû ekatewe û "Hesen"îş derbeder debê. Le Temenî heşt no salegî da kirêkarî dest pê deka. Le diwazda salî da dúbare degerêtewe gundî "Hermêle" lay Xanan û debê be meyster. Paş maweyek serî xoy heldegîrê û derwa berew xeribî. Paş geran û sîraneweyekî zor le şarani Kurdistanî Êran, be cahêlî serî Xanan edatewe, debê be yeke tifengçî axa. Ta rojêk bîr dekatewe ke nokerî û xelk azardan û raw rûtkirin dûr le mirovayeti û piyaweti ye. Her bem honyewe tifengekey dedatewe axa û rû dekatewe Kasbî û debête şagirt şofêr. Belam le bextî reş, le beynî "Seqiz" û "Bane" be maşîn deda le kure cahêlêkî û kure demrê, Hesenîş le tirsîyan heldê. Dîsan wêl û sergerdan yal be yal, dê be dê ta ew careyan le rêgey Pêncwîn pena dehênête Kurdistanî Êraq. Deçête Silêmanî. Paşan şar be şar ta degate Bexda û le mîwanxaney "Şimal el Kebîr" îş dekat, be demîşewe goranî delê û xelkîş dengîyan zor pê xoş debê û yarmetî deden û salî 1953 be yarmetî Neşet Ebdurahman, Hemey Derwêş Kerîm, Selah û Adil Îrfan le Êstgey Radyoy Beşî Kurdî da damezra. Mangî be şeş dînar çîwar bernamew goranî hebû.

Hesen Zîrek mawey pênc sal le radyo êş ekat û salî 1958 Êraqî be cê hêştuwe û gerawetewe bo şarî Bokan. Paş maweyek deçête Beşî Kurdî Radyoy Mehabad. Diway deynêrine Êstgey Kurdî Taran û le wê da zorbey beste rengînekani tomar kirduwe. Her le wêş Mîdya Xanimî Zendî hênawe. Mîdya Xanim lem barewe delê: "Le salî 1958, Hesen Zîrek hat bo malî babim. Bernamew kurdî taze demezra bû. Bernamew kurdî niyazî bû ke jinekî kurd ya kiçêkî kurd qisey têda bikat, min xom kurd bûm û le Taran jiyanim debirde ser. Legel Hesen Zîrek çûm bo radyo. Le îdare destim be kar kird. Mangî le îdare karim kird û mangî duwayîş legel xoy zemawendim kird." Paş zemawend Hesen bo Êstgey Kirmaşan giwêzrawe. Le wê zorbey goranî nayab û awazekani tomar kird.

Le salî 1966 kitêbêkî be nawî "Çirîkey Kurdistan" bilaw kirdewe ke jiyani xoy be honrawe û degel şazde goranî têda bilaw kirdotewe. Kak Fereydûnî Muradî le bira kurdekani Kirmaşan notî goraniyekani nûsiwe û Doktor Mihemed Sidêqî Muftîzadeş pêşekî le ser nûsiwe. Ew le salî 1968 çotewe bo Êraq bo serdanî Silêmanî be niyazî tomarkirdinî goranî bo Êstgey Kurdî Bexda. Belam goranî bo tomar naken. Lem seferey da bo Êraq tû-

şî nehameî û girtin debê. Paş şeş mang giran û jiyani bendixane etrêtewe dest Êran.

Her lem dem û tawey jiyani da li kiçe xoşewîstekani û Mîdyay Zendî lêk ciya debînewe. Le hawîni salî 1968 le nêzîkî Bane Kanî Mela Ehmed çapxaneyekî danawe ke mil edate Kasbî. Lew maweyê da le guzeranêkî naxoş da legel jini tazey da ke nawî Rabî'e bû, jiyani be ser debat. Hesen le ser şirêtêkî ke le wê Ka-

min wez'êkî me'mûlî niye, nawêrim derdî dilî xom lay hemû kes bas bikem. Belam rojêk da dêt pir be dem hawar bike we xelkîş halî bikem ke bo çî nayelin le hiç şiwênêk aram bigirim. Her wextekîş arezûyan lê bêt ewe behaneyekim bo dedozînewe. Têr û pir tēm heldeden û deronewe."

Huseyin Zîrek le barey ew çend şer û gêçeley ke le Bane bo Hesen dirust kirawin, delê: "Ême çend car pêman got ka-

Mihemed Emîn le barey nexoşîyekey Hesen elê: "Rojêkî Hesen hatewe Bokan û gotî kake emin ew la kelekeyem dêsê, la kelekey hate jan, payîz bû. Zistanî guzerand, jinekey em demane bû "mebest werzî behar e" hat gotî Hesen zor nexoş e. Emin û Huseynî biram çûyn bo Şino, le Sablax tûşî Hesen Bûyn, le malî kurî Seîd Zembîlî Elîşa. Eger temaşaman kird nexoş e, detwanê bigerê, qise bika, dadenîşê, nexoşîyekey be ser pêwe bû, êmeş gotman jinekê gotûyetî nexoşî û narahat e. Gotî: "Wela kake narehet im." Pêyan gotûm ebê "Emelî xot bikey" gotman zor çak e emel bike. Hestayn legeliya çûyne Şino. Le wê nardimane Wirmê, eskî berdarî bikat. Eskî berdarî kirdibû be kar nehatibû. Hêna manewe Bokan. Le Bokan nardimane Terwêz. Eks berdariyekî tekmlî û tewaman kird, êre doktor Yar Mihemedî emelî kird. Doktor Yar Mihemedî be êmey negot, be dostan û refiqanî êmey gotibû Hesen seretanî cergiyetî. Lê re ta dû mang. Duwayî koçî diwayî kird. Le rojî 5'î pûşperî salî (1351h.) 1972 ew cihane rûnay becê hêşt û estêrey geş asnamî hunerî kurd kûjayewe bedaxewe.

Le kati mirdinîş da Mîdya û Minalekanî û Rabî'e Xanim le lay bûn. Le pêş da qebristanî şar şardiyanewe. İmanî Cum'ey şar ke le derewey şar bû, taze hatibowe, gotî: "Bîrale eger min lêre bamaye nemdehêşt lê Qebristanî Gewre da binêjin, çunke lay min wesiyetî kirdibû, le kewî Naleskêne bişarnewe," fewrî destûr dira giwêjitanewe bo Naleskêne we êsta gilkuuy ew hunermende le Naleskêne ye.

Le kèlekey nûsrawe:

*Gorî Zîrekî nemir ziyaretgay pîr û ciwanê/  
Cêgay raz û niyaz u miradî aşqanê/  
Eger hatiye ser qebrî şad be, nekey boy bigirî/  
Îşq u şadî ewîni dilî hunermendan e*

Le lay sing nûsrawe:

*Zîrek zorit kird xizmetî huner/ Jinit le pênew huner birde ser/  
Rojgarit satê be bêxem nebû/  
Belam le huner hiçit kem nebû*

Le lay ciwarê nûsrawe:

*Birwane kitêbekey/ Ziyaretî ke kèlekey/  
Kurdî zîndû kirdewe/  
Zîrek be hunerkey Serçawekan:*

- 1) *Be serhatinekanî Hesen Zîrek-Be hawkarî Mihemed Hesnî niya- Nûser Mîrza Kerîm Xoşnaw.*
- 2) *Kitêb gewherî nûser Osman Şarbarjîrî*
- 3) *Newarî giftûgoy xêzan û birakanî Hesen Zîrek legel Radyo Kurdî Bexdad be hawkarî Radyo Qesr. şîrîn.*
- 4) *Kitêbî Çirîkey Kurdistan nûser Hesen Zîrek.*

SEÎD SULÊMANÎ-  
MIHEMED HESENÎ NIYA

*Govarî Sirwe, jimare 139, lapere: 25-27, wergêr bo pitî latîni Samî Berbang*



Hesen Zîrekî nemird

nî Mela Ehmed tomarî kirduwe, delê: "Emin lêre le kew û şaxêk da dejîm, çûn le hemû Êran û Êraq hiç rêga û cêgam niye, şiwênêkim niye têda bijîm. Le beynî du sê kew da çayxaneyekî naxoş a ecaîbim heye. Ger bèn temaşe biken te'ecub demênin ke min çon lêre dejîm. Na pêw xoş e û kasbî lê dekem. Çunke huner le nêw kurda qedrî nema, huner bo min behreyekî nêda, huner bo min karêkî nekird ke bê şiwênî da biçim. Çunke bê zibanî kurdî qise dekem."

Le şewêkî mangî gelawêjî salî 1969 çend neferêk deçin bo malî Zîrek le kanî Mela Ehmed. Zorî lê bedin we şerî le gelya deken. Em şerane gorayî pê nayê. Şewêkî dike ewende be qundaqey tifeng le Zîrek dedin ke dête halî mirdin û herçî pûlîşî hebû hemûyan lê stand. Zîrek le barey em hemû azarewe delê: "Wez'î

ke eto tenha xot û birajine Rabî'ey jinte û kiçekaniş le lay daykiyan in. Ême zor çak detiwanîn be xêwtan bikeyn, yan were lêre kasbî bike. Êmeş yarmetî dedeyn û çawîşman lêt debê we ke kesîş natiwanê bêxud şerit pê bifroşê."

Hesen le wilamî em daxwaze û çen pirsîyarêkî Huseyin delê: "Helbet xoşt ezanî em core şitane be min nakrêt, ba salê dû sê car tēm helden, be feqîrî ejîm. Belam le naw xelkîş serberz ejîm."

Hesen Zîrek le Bane namênê, eçête bo Mehabad. Maweyek le Mehabad dejmênet le wê rojêk efsêrêkî Şehrebanî le ser goranî gotin zorî lê deda ta beyanî le nêw hewzî paşga ke le bendîyan kird û ta çend rojêk nexoş ekewê. Le Mehabadîş namênê, paş maweyekî dîkey dîsan be cêga û ban dekwê. Wa diyar e zemanî nexoşîyekey malê le Şino buwe.

# Rêzimanê kurmancî

## - Wane 16 -

SAMÎ BERBANG

### Rengdêr

Her wekî ji navê wê jî diyar e, rengdêr rengê navdêrekê didêre. Hinek kesan navê "hevalnav" jî li rengdêrê kirine, ji ber ku ew hevaltiya nav dike, navdêrê bi gelek aliyên ve bi mirov dide nasîn. Bi alîkariya rengdêrê mirov navdêrê dinase, reng û rewşa wê dizane.

Rengdêr jî aliyê wateyê ve du bir in; yê ku di binyata xwe de rengdêr in û yê ku di binyata xwe de tiştêkî din in, lê dema dikevin beriya navdêrê dibin rengdêr. Bo nimûne, em dibêjin; reş, kinik, çavşîn tiştêkî tê ber çavên mirov. Yanê ev peyv kesekê/î yan jî tiştêkî bi mirov didin nasîn, wekî; Kera reş, lawîkê kinik, keçika çavşîn...

Ji aliyê peyvsaziyê ve rengdêr jî wekî hemanên din dibin sê beş; xwerû, hevedudanî, pêkhatî. Rengdêrên xwerû, hemanêke tenê di nava xwe de dihevin. Wek; no, tûj, reş, spî, kesk, jîr, berz, xweş, şor, kal, pîr, qenc.... Dema mirov wan rengdêran jî hev bike, tiştêkî watedar ji wan dernakeve.

**Ji bo ku mijar baştir bê fêmkirin, çend mînak:**

Xwarina şor mirov nikare bixwe. Zebeşê kal bi kêrî tiştêkî nayê. Mirovê jîr ji kar û xebatê diyar e.

Xwarina xweş ji hêla her kesî ve tê eci-bandin.

Rengdêrên hevedudanî jî du hemanên serbixwe hatine pê. Her du peyvên ku wan pêk tînin jî bi serê xwe xwediyê wateyekê ne, lê rengdêra nû wateyê nû dide, wekî; Çavreş, pozbilind, payeberz, navno, jinepîr, kalemêr, porspî... Her wekî ji mînanan jî diyar e yek ji wan peyvên ku ew rengdêr pêk anîne bi ser xwe xwediyê wateyekê ne. Yanê hem poz hem jî bilind watedar in. Ji bo sayîkirina mijarê pêwîst e, em çend mînanan jî li ser vê mijarê bidin:

Keçika çavreş dil berdabû welêt. Mirovên pozbilind nabin şoreşger. Çeko hevalekî payeberz e. Mirovê navno nikare dilê kesî xweş bike.

Li hêla din, rengdêrên pêkhatî bi alîkariya peyveke watedar û qertefan pêk tên, wekî mînak; tîrsonek, gundî, jîrek, bengî, navdar, watedar, zêrker

Her wekî ji mînanan jî diyar e, peyvên tîrs, gund, jîr, beng, nav, wate bi xwe watedar in, lê qertafên -onek, -ek, -î, -dar wateyê nû dane wan. Ji bo van cureyên rengdêran jî mirov dikare çend mînanan bide:

Kesê tîrsonek nikare karekî bibe serî. Mirovê gundî dema tîr bajêr, şaşwaz di-

bin.

Gotina watedar tim giranbiha ye. Hevalê min gelekî jîrek e. Zilamê navdar, xwe zû winda dîkin. Kesê zêrker zû dewlemend dibe.

### Celebên rengdêran

Rengdêr par ve dibin ser çend celebên. Her wekî tevliheviya di navlêkirinê de, li jihevderxistinê de jî tevlihevî heye. Lê mirov dikare bi awayekî giştî di bin wan sernavan de wan jî êk cuda bike:

- 1) Rengdêrên çawaniyê (wesfîn)
- 2) Rengdêrên şanîdanê
- 3) Rengdêrên pirsîyarî
- 4) Rengdêrên nebinavkirî
- 5) Rengdêrên jimarîn

### Rengdêrên çawaniyê

Rengdêrên çawaniyê her wekî ji navê wan jî diyar e, çawaniya navdêrê nîşan didin. Ew rengdêr bi du awayan bi navdêrê ve dibin; bi alîkariya veqetandekê wekî "Mirovê baş, keçika bedew, xortê jêhatî, kesê qure, dara hişk, xaniyên kevîrî..." û bi alîkariya lêkera bûn mîna "Ev dar hişk e", "Xaniyê me fireh e.", "Gundê me nêzîk e", "Hevalên min jêhatî ne.", "Birayê min serhişk e."

Mirov dikare ji mînanan jî fêm bike ku rengdêrên çawaniyê rengdêrên resen in. Her wiha divê bê gotin ku rengdêrên

resen jî neguherbar in, lewre jî tu guherîn di wan de çênabe. Ango di nava hevokê de tu qertafan nagirin, tu peyvên wan guherîn bi ser de nayên. Veqetandekên ku piştî rengdêran tên jî jixwe ne veqetandekên rengdêrê ne, lewre jî divê cûda bîn nivîsandin.

Bo nimûne, gava em dibêjin; "Hevala dilgeş a jîrek." Veqetandeka yekjimar/mê /-a/ ne veqetandeka dilgeş, lê veqetandeka heval e. Li vê derê divê me têbîniyekê li ser çewtiyekê binivîsin. Hinek kes dema du rengdêrên li pey hev rêz dîkin, veqetandeka duyemîn dîkin /-î/, yanê dibêjin; "Hevala çeleng î delal", ev bikaranîn çewt e ji ber ku /-î/ veqetandeka navdêrên nêr e, mirov nikare li nik navdêrên mê bi kar bîne. Qertafa /-î/ cihê /-ê/ digire, lê tu car nikare cihê /-a/ bigire. Jixwe di hin devokan de li şûna veqetandeka /-ê/ qertefa /-î/ tê bikaranîn. Mînak, li cihê ku dibêjin "Bavê min got", dibêjin; "Bavî min got." Ji ber vê egerê mirov dikare bibêje; "Hevalê delal î ciwanmêr hat."

Em dikarin bi çend mînanan dawî li mijara rengdêrên çawaniyê binin.

Hevala min a çeleng kete nav refan. Birayên min delal in.

Dayika niştîman li ber dilê min ezîz e. Dara gûza bilind sî daye dora xwe. Karika biçûk winda bûye. Birayên min ên mezî, li dor xwarinê civiyane.

Xwişka min a çavşîn çûye gund.

## Qirêjiya Başûr (2)

NEJDET BULDAN



Şaşî û xeletî jî bo mirovan e. Rêxistin û sazî jî dikarin xeletiyên biken. Xeletî bi piranî ji nezaniyê tên kirin. Mirov, sazî û rêxistin dema kêmasiyên xwe qebûl kirin, êdî careke din wan xeletiyên nakin.

Lê belê PDK (Partiya Demokrat a Kurdistanê- Iraq) roj bi roj xeletiyên xwe zêdetir dike. Mixabin, êdî navê rewş û çalakiyên wê xeletî nîn e. Navê siyasî û tîkiliyên wê îxanet e.

Bêguman partî û rêxistinên bi navê kurdan, dikarin siyasîyê an jî tîkiliyan digel dagirkeran jî biken. Lê pêwîst e ku ew tîkîlî li dijî berjewendiyên Kurdistanê nebin. Tiştêkî xwezayî ye ku partî dijberiya hevdu jî biken. Lê belê bi parastina mafê kurdan û dijberiyê siyasî. Di dîrokê de me dîtîye; dema şerê azadiyê hêzên çekdar tenê êrîşan dibine ser dijminê xwe, dagirkerên xwe. Dibit ku dema gehîştine azadiyê, navbera hêz û partiyên çekdar de li ser desthilatiya welêt jî şer çêbin. Ew jî daxwaza me nîn e. Lê belê li pir welatan ev

çêbûye.

Îro li Kurdistanê girîngiya yekîtiya neteweyî, li pêşiya hemû xebatan e. Ji bo şervanên ARGK'ê jî pêwîstiya çiyayên Başûr heye. Ew çiya bi destê gerîlayan azad bibin, jî bo hemû Kurdistanê ne. Rûmeta gelê Kurdistanê ye. Di ketina leşkerên dagirker a başûrê Kurdistanê de, tu berjewendiyên kurdan çîn in. Tenê karê dijmin e. Ala zer a PDK'ê li wan herêman bilind nabit. Ala Tirkan tê lidarxistin. PDK'ê hevî û daxwaziyan xwe bi tirkan ve girêdaye.

Êrîşên li ser penaberên bakurî çî kara PDK'ê tê de hebû? Dewleta tirk ji navekî navneteweyî ditirsîya. Rûreşiya Dewleta Tirkan hatibû pejiandin. Pirsgrêka kurdan di rojê navneteweyî de bû. Di vê rojê de berjewendiyên PDK'ê jî hebûn. Mixabin PDK'ê ew berjewendiyên gelê Kurd bi siyasî pêpes kirin. Bi exlakî jî destdirêjiya penaberan kir.

Halepçê û hemû komkujiyên Seddam ji bîra PDK'ê çûne. Bi alîkariya tanqên Seddam Hewlêra azad careke din hate dagirkirin. Kurdên ku berê ji xwînxwariya Seddam koçber dibûn, di sala 1996'an de jî ber hevalbendîya PDK û Seddam revîn. Bi hevalbendîya digel Seddam çî derdên kurdaniyê hatine dermankirin? Li cihanê kê dîtîye ku, hêzek bi hevkarîya dagirkerê xwe di paytexta xwe de desthilat bibit?

PDK wan pirsan li xwe naket. Eger

Dewleta tirk xêrxwazê kurdan bit, çima mafên kurdên Bakur nadet? An ji desthilatiya kurdan li Başûr napejirînin. Di êrîşên li ser Başûr de li pêşiyê, çahşên Bakur û pêşmergeyên Başûr tên kuştin. Li hêla din gerîlayan kurdan. Ev yek tê çî wateyê? Wekî li Bakur hinde Kurd bûne cahş ne bes bin, îro li Başûr jî pêşmerge bi destê PDK'ê dibine cerdevan. Navê qehremaniyê li ser wan radibit. PDK'ê bi qirêja xwe navê pêşmergeyatiyê jî hetikand, gemaft kir.

Em baş dizanin ku hêza Başûr a çekdar, bikir firotina mirovan jî diket. Gerîlayan bi saxî tên girtin, difiroşîte Dewleta Tirk. Ev tiştêkî veşartî nîn e. Her wiha dîsa gelê xwe bi pare û bertîl rêdikete Tirkîyeyê û ji wê derê jî, koçberî Ewrûpayê diket. Di vê hêlê de jî pêşberiya valakirina Kurdistanê diketin. Di cihanê da taciriya mirovan rabûye. Berpisyarên PDK'ê bi vê ticaretê dewlemend dibin.

Qirêjiya Başûr ji axa wê nîn e. Ji mêjî û bûr û baweriyên PDK ye. Bi kincên kurdi, çalakiyên tirkî tên kirin. Bi navê kurdan, ramanên kemalîzmê tên xebitandin. Şûştin û paqijkirina Başûr, di riya paqijkirina nokeriye-de derbaz dibit. Di bin xulamtiya dagirkeran de jî tu hêz bi ser nekeftine. Serkeftinên rojê hebin jî, dîrokê de wan bi qirêj û şermezartî binivîstin.

# Heval bavê min!

**D**i sala 1992'yan de eşqa evîna dayîka niştiman ketibû dilê Hevalê Ceng û ew dilgeş bûbû. Qet nedisekinî, dilê wî germ bû. Em bi hev re rûniştin û me soz û peyman da hev. Ê ji me bikaribe wê rahêje çeka xwe û biçe nav arteşa gelê kurd. Wê ew kes, şerê çekdarî û serxwebûnê bike. Yê mayî jî wê doza wan bimeşinin. Her wiha eynî wextê keça min jî biryar girtibû ku tevî refên gerîla bibe. Em bi vê biryarê jî gelekî kêfxweş bûn.

Roja din tevî malbatê em çûn deştê. Me xureka xwe çêkir. Me xwar, piştê jî me dîlan girt. Ji ber ku Hevalê Ceng û qîza min li ber çûnê bûn, me bi hev re wêne kişandin. Herduyan jî îşareta zafêrê kiribûn. Piştî hefteyekê Heval Aydın jî hat (8'ê pûşpera 1992'yan li îzmîrê şehîd ket) û me xatir ji hev xwest. Bi kêf û şahî, me ew bi rê kirin û çûn. Li bajarê îzmîrê, li Kadîfikalê dijmin ew û hevalên wan girtin. Deh şev û deh rojan îşkenceyên xedar li wan hatin kirin. Piştê Hevalê Ceng şandin Girtîgeha Bucayê. Piştî girtina wan, polis hatin mala me, ez jî girtim û ez şandim girtîgehê. Ez û Hevalê Ceng li dora sê mehan di Girtîgeha Bucayê de man. Lê li girtîgehê jî Hevalê Ceng qet di cihê xwe de nedisekinî. Evîna gel ketibû dilê wî, her dem hêrsa xwe bi sloganan dida xuyakirin. Her dilê wî bi arteşa gelê wî germ dibû. Roja 15'ê berfanbarê em bi hev re tahliye bûn. Hevalên li girtîgehê, ji bo me şahiyek li dar xist. Min li wê derê axaftinek kir, di axaftinê de min da zanîn ku heta welatê me azad nebe, dê her tim riya me bi girtîgehan bikeve.

Hevalê Ceng jî bi kurtayî wiha peyivî: "Hevalno! Ez zêde dirêj nakim. Soza min ji hevalê zindanê re û Partiyê re ev e. Dema ez derketim devê derî, ez ê gava xwe ya ewil ber bi arteşa gel ve bavêjim û ez riya xwe ku nivco mabû, bikudinînim." Hevala da çepkan û slogan qîrandin. Hevalê ceng li ber deriyê qawîşê zivirî û slogan qîrandin. Belê bi çokeke mezin bi derve ve diçû. Wê li ser riya xwe ya nivê mabû bimeşiya. Dema em vegeriyan malê, piştî deh rojan Hevalê Ceng xatir ji malê xwest û berê xwe da Kurdistanê. Heftetekê bi şûn de ji malê re telefon vekir û wiha got: "Heval îşe min tamam e. Ez diçim belkî heta çar mehên din em ji we re xeberan bi rê nekin. Çimkî ez ê hinek dîr biçim. Lê ji vê û şûnde ez dê careke din vegerim Çiyayê Xerzanê." Ceng piştî şeş mehan ji min re pusuleyek şand. Di pusula xwe de wiha nivîsandibû: "Heval bavê min! Min perwerdehiya xwe qedand û ez hatim û ez êdî bûm kurê partiyê, ez endamêkî arteşa gelê xwe me. Ez gelek kêfxweş im, xwe gelek bi sîud dibînim ku di bin



Heval Ceng



Serokatîya Partiyê û di nav arteşa gelê xwe de dimeşim û soza min ji Partiya min û ji gelê min re ev e, heya çilkek xwîn di bedena min de hebe ezê bi coş û bi eşq bimeşim." Çend meh bi şûn de dijmin girt ser mala me, çend heval girtibûn hatin ku min jî bigirin, lê ez neketim destê dijmin. Çend mehan li bajarekî metropolê mam. Piştî çend mehan min jî biryara xwe da ku ez jî herim welêt. Meha hezîran (pûperê) bû. Ez çûm welêt û li gundekî Batmanê gihîştim komek hevalên gerîla. Em çûn çavên hev, me hev hembêz kir. Heval fermanîdar pirs kir: "Ev heval kî ye? Me ew nas nekir." Heval ji wan re got: "Ew bavê hevalê Ceng e. Ew bi xwe jî heval

e." Hevalan li çavê hev û din dinihêrtin. Hevalê Xoco berê xwe da min got: "Heval tu qet pirsra Heval Ceng nakî." Min jî got: "Heval min hûm dîtin ji min re bes e." Careke din li hev di nihêrtin. Û heval Xoca bi dengêkî hêdî wiha got: "Heval, wan rojan hevalê Ceng şehîd ket." Min serê xwe bilind kir min li çavê hevala nihêrt û bi dengêkî bilind: "Bila Partî sax be. Bijî Serok, Bijî arteşa gel, Bijî Eniya rizgariya gel!" Hevalno serê we sax be. Her yek jî we, ji bo min Cengek e û cengdarek e. Wa ez hatime ez ê çeka wî hilgirim." Me ji xwe re hinekî sohbet kir, em rabûn. Heftiyekê em bi hev re meşiyen. Çi niqta ku em gihanê, ji hevalê Ceng bi

## Cengdarê cenga giran

Sala 92'yan kar bû biçe Kurdistan

Li Îzmîrê hat girtin

Avêtin nava zindan

Heval Ceng nedisekinî

Li nav diwêrê zindanan

Qir dikir:

Bijî Partiya Karkeran

Lo heval, hevalê Ceng

Cengdarê Cenga giran

Ferhat û Ceng heval in

Şoreşgerê Kurdistan

Ji zindanê derket û

Ew nesîya Kurdistan

Navê xwe danibû Ceng

Cengdarê cenga giran

Lo heval, hevalê Ceng

Cengdarê cenga giran

Ceng û Ferhat heval in

Şoreşgerên Kurdistan

Hilkişîya çiyayê Xerzan

Ket nav refên pilingan

Bû endamê arteşa

Gelê xwe yî Kurdistan

Lo heval.....

Sala 94'an

Ew wiha germa hezîran

Li mintika Badika

Ceng dimeşiya li peşiya kervan

Şevê nivê şevê bû

Ket kemîna nokeran

Ew Amiloyê alçax

Tevî tîmên cerdevan

Şehîd ket Ceng û Ferhat

Ew hevalê dilovan

Lo heval.....

Ferhat û Ceng hevalin

Bûn şehîdê Kurdistan

Çiyayê Xerzan çî xweş e

Bîna şehîden jê tê

Min jî divê ez bin bikim

Agir jî nav dilê min tê

Çeka we ez bernadim

Arama min pir pê tê

Ger ez jî şehîd bibim

Waye kerwan li dû me tê

Lo heval...

xweşî û bi başî behs kirin. Wîsa dida nişan ku Heval Ceng xwe bi hevalên xwe pir dabû hezkirin. Heya em çûn wargeha mezin. Li wargeha mezin fermanîdarê herêmê Heval Serdar ji me re şehadeta heval Ceng bi berfirehî vegot: "Heval Ceng û Heval Boz çûbûn, hevalê ku nû hatibûn ji Farqînê bînin. Her du jî hevalê çeleng û rênas bûn. Şervanên nû hem ji Ewrûpayê hatibûn hem jî ji metropolan hatibûn. Heval diçûn ku wan bînin. Gundek li mintîqa Badikan e li ser riya wan du gundekî çeteyan heyê. navê gund Gundik e, serçeteyê wan, navê wî Amilo ye, xayinekî mezin e, tim û ji tîmên taybet re rêberiyê dikin. Heval şeva 18'ê pûşperê ji Gundik bi rê dikevin. Çardeh şervanên nû jî bi van re ne. Heval Ceng li pêş dimeşe. Di rê de heval Ceng, çeteyê ku hevalê ji Almanyayê hatiye hildigire û dimeşin. Tîmên taybet û bi tîmên Amilo ve di peşiya van de kemîn danîne. Heval Ceng û hevalê ku ji Almanyayê hatibû, di pêşiyê de dimeşin û dikevin kemîna ceşşan xayîn. Di navbera Gundik û Qerîka de şehîd ketin.

Heval Serdar weha digot, Hevalê Ceng, hevalekî gelek dilovan bû fedakar bû. Me gelek tişt jê hevî dikirin. Lê belê şehîdê partiyê nemirin. Em tevî kurê partiyê ne. Ez jî hinek ji hevalê re axivim. Soza me jî şehîden me re heyê, em jî xwe layiqî wan bin û çeka wan li erdê nehêlin. Em doza wan bimeşinin.

XALÊ OSMAN

□ Pûşper 1992:

**Abdulmelik Şêx Bekir (Melek) şehîd ket**

Hunermend û şoreşger A. M. Şêx Bekir di sala 1968'an de li Amûdê hate dinê. Di 1991'ê de tevî Koma Çiya bû. Digel xebatên xwe yên bi Komora Çiya û Amed re li Zanîngeha Çapayê xwendina xwe ya bijîşkiyê didomand. Ligel helbestan gelek besteyên wî jî hene. Melek, di sala 1991'ê de dikeve nav refên gerîla. Ew di pûşpera 1992'yan de dikeve nav refên şehîdan.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 26 pûşper 1945:

**Neteweyên Yekbûyî hate damezirandin**

Neteweyên Yekbûyî (UN) piştî şerê cihanê yê duyemîn, ji bo ku di navbera dewletên rikeber de careke din şer rû nede û li rûyê cihanê aşî pêk were, ji allyê 51 dewletan ve bi rêberiya Amerîkayê hate damezirandin. Neteweyên Yekbûyî bi awayekî fermî di 24'ê kewçêra 1945'an de hatiye avakirin û ji van şaxan pêk tê: Konseya Ewlekariyê, Konseya Aborî-û Civakî, Dîwana Dadê, UNESCO û UNICEF.

# Ji dîrokê rûpelek bi xwîn:


Serhildana Zîlanê piştî ku şervanên kurd 20'ê meha pûşpera 1925'an xeta telgrafê ya derdora Çaldîran û Bazîdê qut kirin, dest pê kir. Dema ev qewmîn pêk dihat, Kor Hûsên Paşa û Emîn Paşa tevî 300 çekdarên xwe êriş dibirin ser nehiyeya Zîlanê û Femandariya Leşkerî ku 20 kilometir li bakurê Erdîşê diket. Di vê navberê de eşîrên derdorê jî tev li şervanên kurd dibûn. Li gorî ragihandina İhsan Nûrî Paşa, şênîya Zîlanê li gorî biryarên ku hatine şandin lebat nekirine, loma jî zû êriş birine ser Hesên Evdalê. Li Hesên Evdalê 200 leşkerên tirk hebûn. Kurdan herêm desteser kirin û leşker dîl girtin.

Dewleta tirk bo ewlekariya xwe ketibû nav

qirkirin. Femandarê artêşa tirk ê li Erdîşê, ji gelê navçeyê daxwaz dike ku ew li dijî şervanên kurd rabin. Di vê navberê de Erdîş demekê di bin qontrola şervanên kurd de dimîne. Di êrişê Zîlanê û çeperkirina Erdîşê de 2 subay, 16 leşker tene kuştin, 150 leşker jî winda dibin. Her wiha ji çekên sivik heta yên giran gelek cureyên çekan dikevin destê serhildêrên kurd. Ji ber ku heta roja 24'ê pûşperê dorpeçkirina Erdîşê didomiyê, dewleta tirk ji gelek navçe û bajarên derdorê alîkarî ji leşkerên xwe dixwest. Di wan rojên ku hêzên kurd li herêmê derbên giran li artêşa tirk dixwest, Femandariya Qorlodya 9. ji Femandariya Giştî ya Leşkerî raporekê dişîne û balê dikişîne ser van xalan: "Alaya Jenderme ya Seyar a 5. bela wela

**ÇAVDÊRÎ**

## Tirkiye divê guh bide raya giştî



MÎRHEM YIĞIT

Ne tenê şarezayên lîkolînên rojhilatnasan li ser Rojhilata Navîn û gelên vê herêmê, belê her meraqdarekî ku hinekî rojê carekê be jî li deng û behsên cihanê temaşe dike, dibîne ku çu carî mîna îro siyasatmedar, analîzkar, înstîtû û zanîngehên cihanê bala xwe nedane pirsgerêka kurd û ew çendî wiha fireh û ciddî li ser nesekinîne.

Bêdulî mirov kare bêje ku fikra ku dibêje "ev pirsgerêkê edî paşguh nabe û hatiye cihê ku nayê şemirandin" diçespe û di lîsteya bûyerên navneteweyî û rojane de cihê xwe xweş dike. Nimûneyên zindî, konferans û civînên çend mehên dawî ne ku li Qahîre, Bêrûd, Cenevre û li Berlînê hatine lidarxistin. Du mehên dawî, meha gulana 20'ê pûşperê de li dû hev; erêban ji bo xurtkirina "diyaloga nav kurdan û erêban", PKDW û ermeniyên li ser hevkarîya neteweyên kurd û ermenî û neteweyên ketine ber şape û êrişê desthilatdarên tirk, înstîtuyên alman û amerîkîyan li ser pêşeroja Tirkiye ku bi nav nebe jî bi naverokê tekîliyê wê ya rastêrast a bi kurdan re heye, TUSAV'ê li ser rê û çareyê siyasî ji bo pirsgerêka heman meseleyê, konferans û civîn çekirin.

Di van konferansan de Tevgera Rizgarîxwazî xalên standart û serekî bûn. Helbet berê jî bi taybetî piştî Şerê Cihanê yê Yekê ji bo diyarkirina rewşê û statûya gelê kurd civîn û rûniştinên navneteweyî çêbûne, pîrsa, 'em kurdan çawa bi cih bikin?' bûye dabaş. Belê yek dudo ne tê de, yên mayî gişan perçeyên Kurdistan kirine biryar û di vê çavoveyê de jî ne li xêra kurdan bûn. Di konferansên îro de her gav ne rasterast û ne bêminaqeşe be jî kurd edî mîna teref û faktoreke siyasî tene qebûl kirin. Bi taybetî rastiya ku PKK hêza serekî ye û gav bi gav ne bi tenê li bakurê Kurdistanê bûye niwênêrê gelê kurd, belê pê re li perçeyê din jî xwedî çekdar û rêxistin e, li wir jî piştî xwe dide gel û ji ber wê jî bîyî ve hêzê û li derveyî wê ev pirsgerêkê çareser nabe, edî ne bi tenê raya pêşverû, belê siyasatmedarên emerîkî yên mîna Henrî Barkey, Graham Fuller û yên Ewropî jî dibêjin. Cardin heman şexsiyet wê bê û pêşeroja Tirkiye û çihgirtina Tirkiye di nav Yekîtiya Ewropa de jî bi çareserkirina pîrsa kurdan ve girê didin, daweya diyalogê li Tirkiye dikin. Seroka Grûbê Sosyalist a Parlamentoya Ewropa Paluine Green girêdayî ve meseleyê wiha dibêje ji nûçevanên Ö. Politîka re: Tirkiye tiştên tene xwestin nayîne cih. Li welatên demokratîk artêş di bin kontrola îdareyên sîvil de ne, li Tirkiye ev berevajî ye. Ev jî bo demokrasiyê kospeke mezin e. Yekîtiya Ewropa li ser du stûnan ava bûye: Konsensus û diyalog. Tirkiye xwe ji minaqeşekirina pirsgerêkên siyasî dide paş. Ev jî ji bo pêşeroja Tirkiyeyê û ketina nav Yekîtiya Ewropa dibe dijwarî.

Dawî:

1- Mirov kare bêje ku gelê kurd ne bi tenê li hundur û di nav xwe de derdikeve qonaxê berzîr û wekî netewe balixtir dibe, belê ji meqam, wezaret û zanîngehên Rojhilata Navîn û yên Rojava jî baştir tê dîtin û ji her gav berbiçavtir xuya dibe.

2- Hêz û partiyên siyasî li Kurdistanê li gora piştgiyaya ku ji gelê kurd digirin û bi nisbet û dereceya niwênêrîyê ku piştî xwe dide ve piştgiyê, di nav platformên navneteweyî de jî xwe ferz dikin û hesab li ser wan tê kirin.

3- Kilîta pirsgerêka çar perçeyên Kurdistanê û giş neteweyên kurd li Bakur e. Li Bakur partiya xurt û bûye partiya milyonan û li Ewropa jî sedhezaran radîkê ser piyan, PKK ye.

4- Dewleta tirk bi duryanekê re li himber hev e. Heger naxwaze mîna hêka qitîkê rût û tazî li raştan bimîne, divê guh bide raya giştî û tiştên di van konferansan de tene gotin û pêşniyazkirin. Ev bi qasî kurdan jî bo Tirkiyeyê jî baş e.

# Geliyê Zîlan



M. KA

bû. Çekên sivik û giran ketine destê serhildêran. Hikma me li Geliyê Zîlan û Herêma Erdîşê nemaye. Gelên herêmê piştgiyeye xurt dide serhildêran. Lewre divê hêzên leşkerî yên li herêmê hay ji xwe hebin; li derdora Erdîşê li dora 80-100, li Zîlanê 100 û li derdorên din jî 60 şervanên kurd hene. 'Eşîra Qalqan' a li Zîlanê tev li şervanan bûye"

Serhildêrên kurd ji destpêkê heta dawiyê, ji bo ku serî hilde bang li gel dikir. Her wiha şervanên kurd gundê Bostanê û riyên Erdîş-Wan û Erdîş-Xelatê xistin bin qontrola xwe. Dewleta tirk piştî ku ji rastiya bûyerê haydar bû, 28'ê pûşperê herêmên Patnos û Melazgirê bi hêzên xwe yên leşkerî dagir kir. Her wiha biryar girt ku, ji 1'ê tîrmehê û şûn de dest bi taqîbata "şakî"yan bike. Leşkerên tirk dixwestin ku tevgera çeperkirinê li dijî hêzên kurd pêk bînin. 200 çekdarên Kor Hûsên Paşa hebûn. Wan girên başûrê Patnosê dagirtibûn. Kurê Kor

Hûsên Paşa Memo dixwest ku Patnosê bi dest bixe. Lê ji ber ku Mitralyozên tirk li mizgeft û minareyan hatibûn bicihkirin, xwe negihand femandariya leşkerî û vekîşîya.

Serhildana Zîlanê bi vî awayî tîk çû. Bêguman di şikestina ve serhildanê de jî dişa îxanetê serkêşî kir. Asteng û îxaneta herî mezin li hember tîkçûna Serhildana Geliyê Zîlanê îxaneta Eşîreta Keşkoyîyan bû. Keşkoyî di ve serhildanê de bi tirkan re bûn yek. Hêzên tirk ku bi alîkarîya Keşkoyîyan Hesên Evdalê careke din xistin bin qontrola xwe, dest bi qirkirinê mezin kirin û bûn sedem ku "Qetlîama Geliyê Zîlanê" di nav rûpelên bi xwîn ên dîrokê de cihê xwe bigire.

Amadekar: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Çavkanî: İhsan Nûrî Paşa 'Hatîratîm'

lez û bezeyeke mezin, lê ne kemalist û ne jî İhsan Nûrî Paşa dizanibûn ku dê êrişêke bi vî rengî bê ser Zîlanê. Li hemberî ve yekê Femandariya Leşkerî ya 5'an bo ku li dijî şervanên kurd derkevin dest bi kar kir. Lê Femandar, tevî leşkerên xwe ketin kemîna şervanan. Di vê navberê de İhsan Nûrî Paşa 20 siwariyên xwe dixwest bin emrê kurê Hûsên Paşayê Heyderanî, Mihe-med Beg. Armanca wî ew bû ku, derdora Erdîşê û cihên asê yên Zîlanê bixista bin qontrola xwe. Mihe-med Beg bi alîkarîya gelên derdorê gir û rê xistin bin qontrola xwe. Her wiha tabûreke leşkerên tirk jî dîl girt û berê xwe da Erdîşê, êriş bir ser balafirgehê, gelek serbaz xistin binçav û tevahiya balafiran texrîb kirin.

Wê demê dişa qirêjiya politikayên Tirkiyeyê derdikevin holê ku gelên herêmê bi hev bidin

# Hunermend

## Rihê musîka kurdî xera nekin



Aramê Tigran, bi stranên xwe bi salan şevbuhêrk û dembuhêrkên kurdan xemilandin. Gelek kurd wî wekî kurd nas dikin û hurmeteke mezin nîşanî wî didin. Îro di nav kurdan de be sadan kesî navê wî li zarokên xwe kirine.

**A**ramê Tigran, wekî em wî nas dikin, hunermendekî ermenî ye, ku bi zimanê kurdî distirê. Dengê wî, li seranserê Kurdistanê belavbûye. Ew bi xwe di sala 1934'an de li bajarê Qamişlo yê ji dayik bûye. Berî 30 salî li bajarê Qamişlo yê, şahî û a-heng li dar dixistin û bi 3 zimanan (ermenkî- kurdî- erebî) distira. Nema ji bo pêşketina musîka kurdî xebatên heja pêk anîn. Çimkî wî, şoreşek di warê musîka kurdî ya nûjen de afirand. Kê ji me stranên Aram nebihîstine? Dema bi dengê xwe yê nazenîn, ev stran digotin: "Şev çû ma tu êdî hew tê lo?", "Leyla Leyla", "Ay dil ay dil dilê min", "Dilbera min", "Wer birîndaro bilbilo", "Yar, yar, yar yeman", "Birîndarim", "Gulîstanê, Hayîstanê", "Tu kullîka ber êvarî" û hwd. Aramê Tigran paşre çû Ermenîstanê. Ta sala 90'î li wir di Dengê Yerewanê stranên kurdî gotin. Vê dawiyê çû Ewropayê û li Almanyayê bi cih bû. Di van salan dawîn de, di MED-TV de kar kir û stranên rojên berê vejand. Di roja 13'ê avrêla 1998'an de hunermend Aramê Tigran bû mêvanê Qamişloka rengîn û me ev hevpeyvîn di gel wî pêk anî.

**Gelek kesên ermenî, tiştên heja ji gelê kurd re pêşkêş kirine. We ji cihekî mezin di dilê civata kurd de hişt. Gelo tu di vê holê de çi dibêji?**

□ Karûbarekî însanî dikeve ser milên min, ku ez civata kurd û ermenî bigihînim hev. Ji ber ku binyata me yek e. Em bi hev re rabûne, em cînarê hev bûn, birîna me, derdê me tev yek e. Ji bir neke ku dijminê me jî yek e. Ji bo wilo, ez dixebitim ku dostaniyeke xurt di navbera gelê kurd û ermenî de ava bikim.

**Tê gotin ku, Aramê Tigran şahî xistiye dilê kurd, ji biçûkan ta bi mezinan. Namerdî nexistiye nav karê xwe. Li vir gelo kurdan ev qenciya te anîne ber çavên xwe?**

□ Ev pirs te yî didoyan ku te da min, ez bi zimanê kurdî xeber didim û kilaman dibêjim. Dê û bavê min di malê de bi kurdî xeber didan û bavê min tim wilo digot: "Fêrî zimanê kurdî bibin. Çimkî xelasiya me li ser dinyayê bi destê kurdan bû. Stranên kurdî bêjin, dostaniya hev bikin. Gelê kurd tev vî tiştî dişêkirine foqiladê (bilind).

**Berpirsyarê Radyoya Yerewanê yê berê Mamostâ Teymûr Xelîl Miradov, di sala 1984'an de got: "Heta niha li dora 60 stranên Aramê Tigran li stûd-**

**yo ya me hatîne tomarkirin." Heta niha çend stranên we yên bi kurdî tomar bûne? Gelo li ser Video-Klîbê jî we stran çêkirine?**

□ Ev pirs te pirsê zehf xweş e. Ji sala 1967'an ta 1985'an li dora 60 kilamên min hebûn. Piştî 1990'î ku em ji Yerewanê derketin û çûne Ewropayê hejmara kilamên min bûn 200. Em hê jî diafirînin û dibêjin. Me gelek li ser MED-TV'ê tomar kirine û wekî hûn jî dibînin em her dem kilamên şoreşgerî dibêjin.

Li ser Video-Klîb, hûn me çenekiriye. Kaseta min ya dawî bi navê "Zilan"ê nêzikê 13 kilam tê de hene, 3 ji wan bi ermenkî ne ên din tev bi kurdî ne.

**Hunermendê kurd Şivan Perwer di hevpeyvîneke xwe ya kevn de gotibû: "Aramê Tigran mamosteyê min ê mezin e" Gelo hûn dikarî li ser Şivan Perwer çi bibêjin?**

□ 8 sal berê leqayî min hat. Ez dikarim bibêjim ku, ew hosteyekî mezin e. Kilamên wî fena (hunera) wî li xweşiya min tîn. Carekê min jê pirsî: "Kak Şivan çima tu qebûl nakî ku ez ji te re bibêjim Seyda?" Wî got: "Na tu yî Seyda yî. Çimkî dema te kilam di gotin em biçûkbûn. Em jî pey te mezin bûne û em zehf hez ji te dikin. Ez spasdarê wî me ku wî

wilo gotiye.

**Gotinên stranên te bi tevayî yên helbestên Cegerxwîn û yên bavê we Tigran Mîlîkiyan in. Ji bilî van we ji helbestên kê strane?**

□ Me ji Seydayê Keleş û her wekî ji dengbêjên wekî Peyvan straye. Dîsa çend kilamên Dr. Sefqan û hin jî yên gellerî û hinek jî em ji pirtûkan tînin, bes xweş be, em dikin kilam. Li vir ez dikarim bibêjim ne şert e, ez kilamên xwe ji helbestvanên mezin wergirim. Ez dikarim ji gotinên zarokan kilaman çêbikim heger xweş bin.

**Çi peywendiya te bi bajarê Qamişlo re heye. Xwezîka ku tu behsa hinek rojên xwe yên kevin, şahiyên ku te li wî bajarî saz dikirin ji me re bikî?**

□ Ez di sala 1966'an de ji Qamişloê derketim û 18 salan ez dîrî Qamişloê mam. Qamişlo her dem li ber çavê min bû, wekî filmekî sinemayê û min digot: "Gelo wê rojek heyê ku ez dîsa vî bajarî bibînim?" Çimkî ev xwelî min dikiştine. Ez li Qamişloê çêbûme. Di vê hatinê de ez di ber mala xwe ya kevin re derbas bûm. Min li derî xist. Xwedîya malê derê vekir, wê nizanibû Aramê kî ye, ji min re got: "Xêr e?" Min jê re got: "Ez dixwazim derbasî malê bibim û ji



# Aramê Tîgrana:

Li ser muzîka kurdî ya nû rexneyeke min a biçûk heye. Bila kes dilê xwe negire. Gelek dengbêj, ev ên ku derdikevin ser televîzyonê, rihê kurdî xera dikin. Kilamên wan diçe rihê hîndî, tirkî û ewrûpî. Ez dikarim bibêjim "Meqam tirkî ne, xeber bi kurdî ne" Ger kilamek dido bûna, xem nîn e lê piranî wiha ye. Şîreta min ji wan re, bila her tim kilasîkên me yê kurd bînin bala xwe. Wekî Hesên Cizîrî, Mihemed Arif...

kerema xwe re qehweyekê çêke" Xwe-diya malê behîfî ma. Ez derbas bûm. Min têr li mal nihêrî, bêhna xwe vekir, qehwa xwe vexwar, min ji xwedîya malê re got: "Ez di vê odeyê de çêbûme. Ez Aram Tîgrana im..." Bi wî awayî min têr serpehatiyên xwe anîn bala xwe.

Me li vir dest li muzîkê kir, li daweta xwe, li şahîya... Ev pêşketina niha tunebû. Şano tunebû. Dîsa jî koma me baş bû. Me bi sê zimanan distira. Koma me ji çend kesan pêk dihat. Sîrop li qernêta (bilûr) dida, Samo û her du birayên min Kevork û Hayîk...

**Wekî tê zanîn we bi gelek dengbêjên kurd re li Ewropayê danûstand kiriye. Gelo bi nêrîna we, muzîka kurdî gihîştîye qonaxekê çawa?**

□ Li ser vê yekê rexneyeke min a biçûk heye. Bila kes dilê xwe negire. Gelek dengbêj, ev ên ku derdikevin ser televîzyonê, rihê kurdî xera dikin. Kilamên wan diçe rihê hîndî, tirkî û ewrûpî. Ez dikarim bibêjim: "Meqam tirkî ye, xeber bi kurdî ye". Ger kilamek dido bûna, xem nîn e, lê piranî wiha ne.

Şîreta min ji wan re, bila her tim kilasîkên me yî kurd bînin bala xwe. Wekî Hesên Cizîrî, Mihemed Arif... Klasîkên kurdî rihê kurdî tînin. Ev kesên nû, rihê frensî dixin nav kilamên xwe.

Ez dikarim bibêjim ku strana kurdî bi pêş ketiye. Çimkî firqa (koma) ew me, Koma Berxwedan û Koma Jiyan xweş in. Li hesabê min tînin. Her wekî kilamên zazakî (kirmancî) jî li min xweş tînin. Çimkî rihê kilamên zazakî nêzîkî ermenkî ne. Heger te got çima nêzîkî ermenkî ye? Ji ber ku li Dêrsimê li ba hev jiyane. Bi salên zehf dirêj, erf û adetên wan wekî hev in.

Kilamên soranî, ew jî kurdî ne lê ez gelekî jê fêhm nakim. Awaza kilamên soranî pir pêşketî ye.

**Çi pêwendî di navbera we û Gerabêta Xaço de heye?**

□ Min Gerabêta Xaço wekî xortekî li Ermenîstanê nas kir. Dengê wî zehf zîz e û bi rihê kurdî kilam digotin. Lê niha pîr bûye. Li Radyoya Kurdî ya Yerevanê ew bi xwe jî hebû. Dema li Qamişlo kilam digotin, ez biçûk bûm. Dengê wî zehf xweş e, ez wî teqdîr dikim.

**Pir ji kurdan navên kurên xwe kirin Aram. Hûn li ser vê çî dibêjin?**

□ Ez pir li rastî vê pirsê hatime. Ez dikarim bêjim min gelek malbat nas kirine ku navên zarokê wan Aram e.

Ez gelekî spasiya wan dikim. Çiqas



qewet û hêza min hebe, ez ê kilamên kurdî bibêjim û teksîr nakim. Çimkî hezkirina min ji kurdan re heye.

**Li gortî agahiyên we girêdana di navbera stranên kurdî û yê ermenî de çawa ye?**

□ Hemû kompozitorên (maestro) mezin, ji bilî Aram Xaçadoriyan, dema saz û awazan diafirînin, bêhemd rihê kurdî dixin nav awazên xwe. Mîna Gerabêta Xaço, Aramê Tîgrana û hin dengbêjên ermenî yê ku li Ermenîstanê dijîn. Çimkî ew xwe mecbûr dibînin ku rihê kurdî bixine nav stranên xwe. Ji ber ku kurd û ermen bi hev re xwedî bûne. Lê Aramê Xaçadoriyan, taybetiyekê wî hebû. Feneke wî cuda hebû.

**Çimkî hûn ji mêj ve li bajarê Qamişloke bûn. Ez ê çend navên stranbêjên kurd yê kevin bêjim. Tu nêrîna xwe di wan de bide. Mihemed Şêxo, Seîd Yûsiv û Şêrîne?**

□ M. Şêxo, teqdîra min jê re mezin e. Rehma xwedê lê be. Ez ê bûyerekê ji te re bêjim; Carekê ez hatim Qamişloke. Wî zanibû ku ez ê bêm. Hate pêşiya min xwest ku min bibe mala xwe. Birayê min jî hatibû metarê (firoşgeh) jê re got "Ev birayê min e, wê bê cem min" Rehmetî lê vegeand û got: "Aram birayê min e, berî ku birayê te be"

M.Şêxo; mektebeke xas e li Suriyeyê. Rihê kurdî di kilamên wî de heye.

Seîd Yûsiv; Li cem me li Almanyayê ye. Ew jî hunermendekî ne xerab e. Tiliyên wî û saza wî zehf bi min xweş in. Kilamên wî piranî xelkê strane. Teqdîra wî li ba min heye lê dengê wî yê daweta ye. Bila li min negire bes dîsa ez dibêjim tiliyên wî agir in.

Şêrîne, dengê wê şêraniyekê tê de heye. Gelek caran min ew bi Seîd Yûsiv re dîtîye. Axastînen wê jî min li ser televîzyonê bihistine. Zehf spehî ne.

Li vir ez dixwazim navê dengbêjekî kurd bînim holê, navê wî Mirado ye.

Zehf kêfa min jê re tê. Li kemaçeyê di-de. Eger ez ji sibê heta êvarê lê guhdarî bikim, tu car jê aciz nabim. Çimkî rihê kurdî tê de heye.

**Çi programên te yê hûnerî bi gelperê di paşerojan de hene?**

□ Min komek saz kiriye. Kom, ji çar keç, pênc kur û ji şeş sazbandan pêk tê, navê komê "Masîs" e. Masîs jî navê çiyayekî biçûk e li kêleka Araratê. Ez wan hîni kilamên kurmancî dikim. Ew bi ermenî dinivîsin û bi kurdî dixwînin. Ji bo ku em çend kilaman bo televîzyonê tomar bikin.

Kilamên min bi yewnanî kêmin in. Ji bilî kilama "Teophîleos Georgîadis" Ew jî navê şehîdekî me yê ermen e, ku li Qibrîsê bi destê tirkan hatibû kuştin. Gotînen kilamê, min ji helbesta qîza wî standiye ku avêtiye ser bavê xwe.

Jixwe kilamên Suryanî jî kêmin in. Heger tu ji min pirsî, tu çawa fêrî Suryanî bû? Ez ê bêjim ermen, kurd, suryanî, aşûrî tev gelên bindest in û çimkî em giş li Qamişlo kê cînar bûn. Ez zû hîn bûm û bi taybetî Suryanî çimkî zehf nêzîkî errebî ye.

**Ji ber ku hûn bûne sembola hevalbûna gelê kurd û ermen, hûn li ser peşerojê çî difikirin?**

□ Kurd û ermen rihê in, bi hev re cînar bûn. Kurdan bi ermenî xeber dida, ermenîyan jî bi kurdî xeber dida. Lê dijmin navbera me xera kir. Ez hêvîdar im ku, em vegeerî wekî şaxê darekê wekî berê dest bi dest dostaniyê qewmî bikin, da ku em karibin ji heqê dijminê xwe derên.

Niha li Ewropayê jî wê MED-TV dorasætek û nivê mecal hîde me, da ku em bi ermenî programên (bername) xwe biweşînin. Ev jî di navbera her du gelan de peywendiyê xurt diafirîne.

**Saz û awazên we ji ku tînin? Gelo hûn datînin an hin hene alîkariyê bi we re dikin?**

□ Saz û awazên min ji sedî 95 yê min in û ji sedî 5 yê xelkê ne. Ez her roj nivê şevê piştî 12'an dikevim odeyekê û elhana (beste) çêdikim, ta ku dikevim nava xwedanê. Bi dawî sazeke xweş diafirînim û di nava xwe de dibêjim: "Xwedî! Ev saza min ne wekî yê din bin an jî ne wekî yê xelkê bin" Çimkî sazbandê hêja ew e ku sazê xwe bi xwe biafirîne.

Hevpeyvîn: EBDULBAQÎ HUSEYÎNÎ

# Nivîskarî Divê Bibe Pîşe

Nivîskarên me, di dema xwe ya betal de, bi karûbarê wêjeyî radibin. Bi kurtasî wêje û nivîsa kurdî ne di destê zana û hunermendan de ye. Yên ku hinek bi rêziman û rastnivîsa kurdî dizanin, dibin nivîskar. Lê nivîs û raman ne lihevhatî ne. Bi baweriya min, wê demekê wisa bidome. Heta ku wêjedarî û nivîskarî bibe pîşe.

**W**êjeya nivîskî ya kurdî ne temendirêj e. Nemaze ya kurmançî nû ye. Nestewiyaye û di nav gel de şax bernedaye. Nivîskarên me jî karûbarê wêje û nivîskariyê, wekî pîşeyekê nehesibînin. Ev kes, di dema xwe ya betal de, bi karûbarê wêjeyî radibin û pê sebra xwe tinin. Dîsa ji ber karê wêjeyî ji aliyê aborî ve tu hatin (gelir) nakeve destê wan. Bi ser de jî ji ber kaxiz, kompetur û lêçûnên ragihandinê dixesirin. Lewre jî girîngiyê nadin vê pîşeya girîng û hêja. Li aliyê din xwendevan jî ji layê xwendin û hîndekariyê ve zêde ne pêşketî ne. Ew dibêjin: "Bes hema bila kurdî be!" Xwendevan bi awayî dilxweş û piştrast e. Nivîskar jî zanabûn xwe têr dibîne û li pêrgî rexneyên xwendevanan naye. Ew jî dilgeş e. Çawa tê aqilê wî/wê wisa dinivîse û pêşkêşî xwendevanan dike. Ji ber van sedeman nivîskar jî pêş nakeve. Xwendevan jî sîdeke berbiçav, ji nivîsên nivîskar wernagire. Jixwe ev ne xema nivîskar e jî. Ma zêr jê qezenc kirine!

Bi kurtasî wêje û nivîsa kurdî ne di destê zana û hunermendan de ye. Ji xweber e. Yên ku hinek bi rêziman û rastnivîsa kurdî dizanin, dibin nivîskar û dinivîsandin. Lê çawa nivîs û nivîsandin? Babet û nivîs, nivîs û raman, raman û gotin ne lihevhatî ne. Bi baweriya min, wê demekê wisa bidome. Heta ku wêjedarî û nivîskarî nebe pîşe.

Mebesta min, ger nivîskarî ne karê bingehîn ê nivîskar jî be, divê nivîskar berhema xwe bi têgîn û peyvên wêjeyî bixemilîne û haya wî/wê ji babet, siruşt, erdnîgarî, dîrok û hêmanên cur bi cur hebe.

Di vê nivîsê de, ez dê li ser çend nivîskaran rawestim û li çend çewtiyên wan rexneyên dostane bigirim. Ev kes jî dikevin nav çarçoweya jorin. Kes gîlî û gazinca wan nake. Jixwe ew jî nebin, em dê di tariyê de bimînin. Madem ev kar hildane ser milê xwe, divê bi rexneyên min ne-êşin. Hinekî din serê xwe bi vî karî re biêşînin. Ku ji pêşerojê re bibe bingeh.

Berî ku ez dest bi çewtiyên nivîskaran bikim, divê çend babetên tîkel û aloz, bi kurtasî rave bikim:

**1- Gotar ( Makale):** Cureyekî berhemên wejeyî ye. Ji destpêk, navend û encamê pêk tê. Wekî cure gotarên zanistî, ramiyarî, tendirustî, aborî û hwd hene. Dema gotar tê nivîsandin, divê ji

Firat Cewerî di pirtûka xwe ya bi navê 'Girtî' di çîroka 'Serboriya Temo' de şayeseyên nalebar kirine. Diyar e ew, derbarê zivistanên Erzeromê û Qerekose de ne agahdar e. Nizane ku ne baran û ne jî berf, zivistanan li wê herêmê nabare. Ma ku zivistanan berf û baran bibariya, çima wê evçend sar bûya? Berfa payizê dibare, heta biharê jî erdê ranabe.



rasteqîniyê dîr nekeve. Divê xwendevan ji gotarê sîde wergire. Nivîskar jî pêwîst e, li ser mijarê bi têrê xwe lêkolînê bike. Aliyên nezelal ji xwendevan re rave bike. Bi bêje û biwêjên wêjeyî nivîsê bixemilîne, da ku xwendevan bi dilbijî li xwendina gotarê germ bibe. Bi vê yekê nivîskar jî bextewar dibe. Nexwe xwendevan tu girîngiyê nade nivîsê û xebata nivîskar jî bi kêr naye

**2) Serpêhatî:** Ev jî cureyekî berhemên wêjeyî ye. Mîsoger e, rasteqîn e. Ne çîrok e. Divê çî û war, dem û dewran tê de diyar be. Bi hevok û biwêjên seyr neyê neqîşandin. Wekî mînak: "Çemê Ferat ji bakurê Kurdistanê der-tê, diherike Kendava Basrayê. Zivistanê baran li Erzeromê, Qers û Qarakose nabare. Çiyayê Agirî li Serhadê û Cûdî li Botanê ye. Kurdistan li Rohhilata Navîn e."

Dema ku teorî û pratîk li hev û din

nekin, wê kêmasiyên mezin pêk bînin. Li ser van mijaran jî çapemeniya kurdî çend mînak:

Mînaka yekem, gotara birêz Faysal Dağlı bi sernavê "Sî û Bajar" rojnameya Azadiya Welat hejmar 80, 10 gela-wêj 97 rûpel 5. "Bajarê Amedê... Hepsiyên bajêr, li ber pacên rojhilatê, ku li Qerecdaxê dinihêrin, li ser ranzeyên xwe rûniştine..." Ev hevok bi biwêjên seyr û nalebar hatine xemilandin.

Xala yekem: Birêz Dağlı, bi vê dûmena yekta, rewşa girtiyên Zindana Amedê xweş û erênî şayese (taswîr) kiriye. Tu nemabû ku bêje girtiyên Tevgera Rizgariya Neteweyî li ser maseya ku rûberê (berga) wê ji çoxê kesk, rûniştî ne. Nergelê di devê wan de bi qumarê dilîzin.

Xala duyem: Meseleya pacên ku li Qerajdaxê dinihêrin. Li Girtîgeha

Amedê pacên şikbeyên (qawîş) girtiyên nûn in. Pac û zindan? Du termên nalebar in. An girtîgeha Amedê ne zindan e an jî em bêbextiya li tirkan dikin. An jî nezanî, çewtî û nalebarî tê de heye.

Xala sêyem: Li aliyê din Qerajdax li Sêwregê ye. Di vir de çewt nasandin heye. Qerajdax li rojhilatê Siwêregê ye. Ma Qerajdax li başûrê rojavayê Amedê ye?

Mînaka duyem jî, nivîsa Nûşer Dîlan e. Bi sernavê "Gerîla û Seyro" Rojnameya Welatê Me, Hej:93, 28 Sermawez -1993 "...Şev reş e. Bayê kur mîna cilêta tûj e. Dev û guh li wan dişewitîne. Hêstir şeşe şeş ji çavên wan tene xwarê.

Beledî (birûsk) vedibin. Şewq û lêlanê bi hawîr dixin. Gurme gurme tavan guh li mirov ker dike. Ne bi tûwî baranê dest pê kir. Mirov di go qey ezman qul bûye..." Erê. Nûşer zehmetiya ku gerîla dikişîne aniye ser zimên. Lê ne pêwîst bû ku, têgînên seyr û nalebar di xemilandina nivîsa xwe de bikar bîniya. Em hemû dizanin, tu caran li Kurdistanê beledî, gurmîna tavan û bayê kur di heman demê de naye dîtin. Dema bayê kur hebe, ezman çik sayî ye. Ewr û baran çênabe. Ewr û baran bi bayê reş û yê xerbî dikeve. Ew destbirakê hev in. Di demek wiha de bayê xerbî jî pir sar e, mîna cilêta tûj guh û dev li mirovan dişewitîne.

Mînaka dawî jî, ji kurteçiroka Firat Cewerî ya bi navê "Serboriya Temo" ku di pirtûka "Girtî (rûpel:80)" de çih digire ye. "...Law û Bav ketin rê û meşiyên. Dinya her ku diçû nexwestir dibû. Ewr weke merşeke reş li ezman vir de û wir de diçerixîn. Piştî ku ew jî gund bi dîr ketin, baranê dest pê kir. Lê çî baran... Mirov digot qey bi kûzan tê... Law û bav meşa xwe domandin... Jixwe zivistanên Erzeromê pir dijwar in..." Ji vê dixuye ku, birêz Cewerî derbarê zivistanên Erzeromê û Qerekose de ne agahdar e. Nizane ku ne baran û ne jî berf, zivistanan li wê herêmê nabare. Ma ku zivistanan berf û baran bibariya, çima wê evçend sar bûya? Berfa ku payizê dibare, heta biharê jî erdê ranabe.

Bi baweriya ku ev rexne li guhê nivîskar û hunermendan bibe guhar.

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- 20 pûşper 1998 şemf: Konsera Grup Munzur, saet:16:00
- 21 pûşper 1998 yekşem: Konsera Koma Agirê Jlyan, saet:14:30
- 26 pûşper 1998 fn: Ji beşa Sînemayê ya NÇM'ê; Film, "Kanal", derhêner: Andrzej Wajda, saet:18:00  
Beksav
- 20 pûşper 1998 şemf  
Film: "Mirina Firoşkar (Saticînin Ölümü)",  
derhêner: Volker Schlöndorff, saet:19:00

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM'ya İzmirê

- 20 pûşper 1998 şemf:  
"Şevên Toreyê"  
Amadekar: Jiyana Rewşen
- 21 pûşper 1998 yekşem:  
Konser: Agirê Zerdest, saet:17:00
- 26 pûşper 1998 fn:  
Konser: Vengê Sodirî, saet:18:00

## Ji Zanîngeha Azad Nivîskar Erol Anar:

# "Rewşenbîrê tirk bênasname ye"

Ji bo ku yek rewşenbîriya xwe bîne cih, hewce ye dilê mirovahiyê li ku xwîn dibe, ew jî li vir be. Îro li Kurdistanê xwîn dirije, îro Filîstînê xwîn dirije, hewce ye ku rewşenbîrê tirk jî li wir be



Nivîskar Erol Anar

Konferansa bi navê 'Rewşenbîrên tirk û Ewrûpaperwerî (Euro-Centrism) roja 17'ê pûşperê li Navenda Çanda Mezopotamya şaxa İzmirê bi beşdariya 100 kesî ve hati lidarxistin.

Konferans ji aliyê Erol Anar (Zanîngeha Azad) ve hate pêşkêşkirin. Di konferansê de li ser rewşa Rewşenbîrên tirk û nasnameya wî hate rawestîn. Li gorî Erol Anar rewşenbîrên tirk tu çaxî nebûye xwedî nasname. Anar sedema vê yekê jî wiha nîşan da ku rewşenbîrê tirk her tim li bal dewletê cih girtiye, tu çaxî daneketiye nava gel. Wan ji endamên dewletê bêhtir xwe wekî endamê dewletê ditine.

Erol Anar dibêje ku fikra a Ewrûpaperwerî 200 sal berî niha wextê Şoreşa Lale (Lale Devrimi) çêdibe, dewleta osmanî li hemberî dewletên ewrûpî paşve dimîne, wê çaxê dest pê dike. Wê demê di navbera rewşenbîrên tirk de du fikir derdikevin holê, ji aliyekî ve modernîzm, li aliyê din kevnaparêzî. Aliyên modernîst Erûpâyê wekî cihê ronahiyê, wekî dergûşa mirovahiyê dibînin û Rojhilata Navîn jî wekî cihêkî lipaşmayî dibînin. Aliyên kevnaparêz jî Ewrûpâyê red dikin û wekî cihêkî hovane dibînin. Li gorî fikra Anar ev her du fikir jî çewt in.

Erol Anar dibêje ku rewşenbîrên tirk tu çarî rastîya xwe nedîtiye, hinekan berê xwe daye Ewrûpâyê hinek jî di bin bandora ola îslamê da mane. Ji ber vê yekê jî nasnameya xwe nedîtine û bê nasname mane. Anar got ku ji bo rewşenbîrên tirk nasname ya xwe bibîne, hewce ye ku dakeve nava gel, pirsgrêkên gel, bi çand û hunera gel re bibe yek. Ji bo ku rewşenbîriya xwe bîne cih, hewce ye dilê mirovahiyê li ku xwîn dibe, ew jî li wir be. Îro li Kurdistanê xwîn dirije, îro li Filîstînê xwîn dirije, hewece ye ku rewşenbîrê tirk jî li wir be. Erol Anar li ser pirsê "Îro rewşa rewşenbîrên kurd çi ye?" jî wiha bersivand. "Bi têkoşîna neteweyî ya gelê kurd re îro rewşenbîrên kurd jî doza mafên xwe dikin, ev jî dide nîşan ku rewşa rewşenbîrên kurd îro baş e. Konferans bi pirs û bersivên beşdaran bi dawî bû.

AZADIYA WELAT/İZMİR

## VEWXWENDNAME

"Bi zimanê mêtîngeran civaka azad nayê afirandin."

Ismail Beşikçi

Piştî vebûna Şaxa Mêrsînê ya Azadiya Welat, îcar jî li İzmirê şax vedide. Em hemû kes û saziyên demokratîk û welatparêz vedixwînin, pîrozbahîya vebûna şaxa İzmirê. Hatina we dê bibe sedema dilgeşîya me û geşedana doza me. Azadiya Welat guleke sor e, li İzmirê şax vedide, werin bi evîn û piştevaniya xwe geştir bikin.

Cih: 1039 sok. No:2 Kat/5 Li ser DEHAP'ê ye.

Tel: 0 (232) 425 37 02

Mêjû: 27.06.1998

Saet: 14.00

## TÎŞK

### Tûrikê dilê nivîskar



HASAN KAYA

Ji bo tarîfa nivîskar ravekirinê cihê reng hene. Yên ku li ser hişê min mane ev in: "Nivîskar şahidê heyama xwe ye.", "Nivîskar mîna mirovekî ku neynikê li ber civakê digire ye.", "Nivîskar mîna Xwedê afirîner e.", "Nivîskar ew e ku di hemû temenê xwe de bikeve dûv rastîyekê." Gelek caran têkildariya nivîskar û civakê jî, ji devê zana û ronakbîran hatiye vegotin. Gelo, nivîskar xwedî peywir e ku civakê perwerde bike an nê? Bersiva vê pirsê û gelek baweriyên din di navbera nivîskar û hunermendan de êkolên cihê derxistine holê. Li gelek welatan, "Gelo divê ku huner ji bo civakê be, yan jî bo huner be?"

Di van tarîfên li jor de sê çar peyv hene, ku pir bandor li min kirine. Şahidbûn, afirîner û rastî... Lewre ji civaka me re çavên ku baş dibînin, pêwîst in. Bûyerên ku diqewimin, nerastiya ku li holê, divê ku bi çavên hestiyar û hûrbîn ji nû ve bêne afirandin. Gelek caran tam û çêş di kîtekiteyan de ye, divê ku ev bûyer bi kîtekî bêne tomarkirin. Helbet nivîskar dê ne mîna kamerayê bûyer û qewmînan tomar bike, ne wiha mekanîk e. Divê ku bi hestiyariya nivîskar û hunermendekî bêne tomarkirin.

Gelo mirov dikare bi çî awayî, awira pisîka ku li gundê şewitî yê xwediyê xwe bi tena serê xwe mabe, bîne zimên. Em hinekî bifikirin, dayikeke ku bi delalî keç û kurên xwe xweyî kiribin. Jixwe du zarokên wê hebin. Bi salan ked dabe wan. Hezîkirina civaka me jixwe tê zanîn. Hinekî bi kezêbê ve tê girêdan. Dema ku di navbera sê mehan de ev keç û kurê ciwan mîna du bazan bifirin û herin. Hêlîn virt û vala bimîne. Mirov çawa vê dimenê bi hevokan bihone? Mirov dikare 24 saetên wan bifikire. Çi tê bîra wan, bi hev re çî dipeyivin? û hwd. Em careke din jî bifikirin; gotina tahl, xebera şehidbûnê ya van her du berxikên diya xwe di nav salekê de ji malbata wan re were, çî diqewime? Di nav dil û mêjiyê dê û bav de çî tofan, çî ba, bager û bablîsok radibin.

Nivîskarek dikare van hestan ji çan û dil hîs bike, an jî bibîne. Ma nivîskarekî/e ku di vê civakê de bijî, ne mecbûr e vê rastîyê bibîne? Ev xwe şahid e; ma ne mecbûr e ku vê bûyerê ji nû ve biafirîne? Ev mecbûriyet ne ku bi yasayên li ser kaxizê û hwd. ve gîredayî ye. Ev mecbûriyet tişteki şuştî ye. Mirov nizane ka çima mecbûr e jî. Lê hema hêzek, tafekê li mirov dide û bi mirov dide nivîsandin.


Gelek caran ji nivîskarekî an jî hunermendekî tê xwastin ku ew li ser êş û kulên gel berhemana biafirîne. Wekî mînak mirov dikare Nazîm Hikmetê ku şairekî mezin e gelê tirk e bide nîşan. Gelek caran hatiye gotin ku çima wî li ser rewşa gelê kurd tişteki negotiye? Lê dema ku der barê tişteki de gotin di tûrikê dilê nivîskar de nebe, tu wî bikujî jî ew nikare berhemeke xweş biafirîne.

Her nivîskar digel der û dora xwe, civaka xwe, ji nû ve xwe jî diafirîne. Ew jiyana xwe ya hundiyan, kela dilê xwe vedibêje. Heke nivîskar tişteki ku jê re biyan be, bixwaze bîne zimên, ew bi ser nakeve. Wekî ku nivîskarekî gotiye, mirov di kesayetiya xwe de kesayetiya mirovahiyê dadihurîne, vedikole, çavdêr dibe.

Nivîskarên ku li cihanê deng vedidin, ên ku bi hestiyariyê gewre, bi ferasetêke cihanşumûl û bi çavdêriyê hûrbînî dinivîstin in.

## MAMIK

Hopanî Mopanî  
 Keziya Banê banî  
 Kekê min çawîş e  
 Çawîşê biçûk e  
 Jê re hanîn bûk e  
 Keça Hesên Begê  
 Sêva ser çelengê  
 Tasa min xulxulî  
 Kuta serê dilî  
 Çîk firî Mûsilî  
 Mûsila mîrkê xasî  
 Botanî kirasî  
 Keko bi deştê re  
 Tenbûr bi piştê re  
 Ber mala Fatê re  
 Fata qilopanî  
 Ketiye dêza danî  
 Got: Teyro, teyro çi ye?  
 Keça Hesê beraz  
 Dest avêt şêrû taz  
 Meydan ji xortan re  
 Di- xwaz



## Mar û beq

Mar û beq bûn du heval  
 Bi dilekî pir zelal

Gotin emê xebat kin  
 Neyartiyê ji holê rakin

Giş lewir gel bibin yek  
 Xayintî nebe gelek

Hinan got mar neyar e  
 Kî ji wî hovî re yar e

Hinan bawerî neanîn  
 Mar ji nav xwe deranîn

Mar gelek ma şermezar  
 Qehirî xwarin nexwar

Gote: Wan ne neyar im  
 Ez ji we gişan re yar im

Ji bo dest lingên min nîn e  
 Kesek min nahebîne

Ez mîna we dimeşim  
 Ji zarokan re kêfxweş im  
 Kir gazî hevalê beq  
 Got: Bes e bike şeqe req



De lezke were vir  
 Bedî min hinek sebir

Heval ji min hes nakin  
 Divên min ji xwe cuda kin

Bê heval jiyana nabe  
 Ev rewşeke pir xerab e

Em yekîtî dixwazin  
 Cuda, ne serfiraz in

Beqa zer rabû piyan  
 Kir gazî giş hemiyan

Got: Ez deng bêsê we me  
 Çima dilê we xem e

Beqa zer civîn çêkir  
 Xemlek aşitî lê kir

Nevintî ji holê rakin  
 Emê zarokan bakin

Kêfa dilê wan xweş kin  
 Rûyê wan ê ken geş kin

Tewiran girtin dîlan  
 Kirin şahiyêke giran

Ketin eşqa jiyane  
 Bûn dengê daristanê

Şandin selamên germ  
 Wan lewrê xweşik nerm

Giş man hêviya biharê  
 Hişîn be pelê darê

Bi hev re bikevin seyranê  
 Her çar hêlê cîhanê

# Çengek av ji behra folklora kurdî:

Xwençe, xebateke an-siklopedîk e û ji deh rêzepirtûkan pêk tê. Rûpelên her cildekê li dora 270-300'yî ye. Vê dawiyê cil-da 10'an a Xwençeyê jî derçû. Nivîskarê vê xebatê Zeynelabedîn Zinar e.

Ev xebat, ji berhemên folklorîk yê kurdî pêk tê. Bi gotinên pêşyan, klam û stran, meselok, pêkenok, lawêj, şîret, serpêhatî, çîrokan hatiye xemilandin. Zeynelabedîn Zinar, li ser vê xebatê wisa dibêje: "Gava min di 1985'an de projeya Xwençe saz kir, min zemanê wê deh sal danîbû. Lê du sal bi derengî çêbû. Gelek kesan ji min re berhemên folklorîk hinartin. Piranî jî bi şerîdan dişandin. Ev tiştên folklorîk yê ku di van her deh cil-

dan de ne, her wekî mirovêk here ser okyanûsê û çengek ev jê hilîne ye. Min çengek av ji folklora kurdî hildaye û di van deh cil-dan de daye hev. Wekî nimûne, hemû çîrokbêj dema çîroka 'Gul û Sînem' pêşkes dikin, pêşîn dibêjin: 'Heft şaxên vê çîrokê hene lê ez tenê yekê dizanim. Min heta niha sê şaxên vê çîrokê bi dest xistine û dane weşandin. Lê hêj çar şax mane.'

Bergên cildên xebata navborî tev "kesk, sor û zêr" in. Lê ya dawîn spî ye. Di rûpelên duwê de têbîniyeke bi rengî heye: "Ji 1980-1984'an çî dema wan ez girtim, ji îşkenceya fizîkî zêdetir, îşkenceya psikolojîk



li min dikirin û her dem digotin: 'Bi navê kurdî zimanek û bi navê kurd miletek nîn e. Hûn doza parçekirina welêt dikin.'

Gotinên Zinar yê li ser pirtûkên wî jî watedar in: "Heta niha 36 pirtûkên min çap bûne. Ez niha li ser 15-20 pirtûkên din jî kar dikim. Tu mafê zarokên min di van xebatên min tune ye. Lewre ez hemû pirtûkên xwe hibeyî Kürdistana azad û demokrat dikim."

Zeynelabedîn Zinar, di sala 1953'yan de, li navçeya Reşkotanê ji dayik bûye. Wî, dibistana îmam hatîp qedandiye. Heya niha gelek caran hatiye girtin û 5 salan jî di girtîgehê de maye. Zinar, niha li Swêdê dijî.

GABAR ÇIYAN


## Jiyana Rewşen derket

Hejmara kovara Jiyana Rewşen Heya meha pûşperê derçû. Di vê hejmara 20'an a kovarê de hevpeyvîna ligel Teatra Jiyana Nû wekî nivîsa sereke berbiçav dibe. Di vê hevpeyvînê de serpêhatiya danîna komê û pêvajoya ku Teatra Jiyana Nû tê re derbas bûye, tê diyarkirin. Her wiha di van beşê hevpeyvînê de, xwendevan li ser serdema amatori û profesyonelî ya komê jî agahdar dibin. Li aliyê din nirxandina endamên Teatra Jiyana Nû ya li ser problemên komê yê di warê zimên de jî balkêş in. Dîsa di hevpeyvînê de li ser astengiyên di warê şanonivîsê de, şewaza komê ya teatral û listikên komê de nirxandin hatine kirin.

Di vê hejmarê de balkêştirîn nivîs, quncikê bi navê "Ava Sar" e. Di vê nivîsê bi sernavê "Ji Lênûska Biçûked Kurdan" de, Cemil Denli bi awayekî mizahî û aforîzmayî hin peyv û têngin rave kirine.

Li layê din nivîsa Sîrwan Rehîm ya sebarek bi jiyana û helbestvaniya Goran jî serincrakêş e. Endamê Koma Çiya Genim jî, li ser hunermendî û jiyana Tahsîn Taha nivîsek amade kiriye. Her wiha di hejmarê de pexşana Nuray Şen ya bi

bi sernavê Dicle, nivîsa F. Huseyn ya bi sernavê Seyid Eliyê Findikî cih digirin. Ji bilî van kesan Tengezarê Marîni, Mahmut Yamalak, Ekin Yılmaz jî bi nivîsên xwe di vê hejmarê de cih girtine.



Wekî helbest jî di vê hejmarê de helbestên Cegerxwîn, Jan Dost, Kawa Nemir, Rojen Bernas, Hasan Harran, Abdurrahman Çelik, İlhamî Özer, Emerê Dozger, Nihat Çelik, Dost Çiyayî, Kamiran Bêkes hatine weşandin.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Tovqelîna ermeniyân

OSMAN ÖZÇELİK



Ji me re gotibûn: "Kî yekî fileh bike misilman, wê biçe cennetê." Ji ber vê, em her yek bûbûn nêçîrvanek û me zarokên filehan dişopandin. Ji tîrsa me, ew tu caran bi tena serê xwe nedigeriyan. Kengî me yek ji wan bi tenê didit, em, çar-pênc li hev vedihewiyan û me ew dikirin quncikekî û me ji wan re digot: "Eşheda xwe bîne û bêje ez bûm misilman." Heke ew, dido an sê kes bûna, em çiqas pîrbûna jî, me nikarî xwe di wan de derxista. Mîna xezala nêçîrê, bêhêvî bûn, bêpişt bûn. Reng li rûye wan diqulipî, lêvên wan diricifin û bi kîneke kûr digotin: "Eşheduenlaîlahêiljahwe."

Di ser re sî û pênc sal derbas bûye, belê hê jî ew tîrs û kîna di çavên zarokên filehan (ermeniyân) de, ji bîra min naçe. Wan bi sedan, bi hezaran serpêhatiyên qirkirinê, tevkuştinê bihîstibûn.

Me bi xwe nizanibû eşhed bixwenda. Belê zarokên filehan beriya ku hînfî xaçderxistinê bûbûna 'Eşhed' a misilmanan ji ber kirin. Û wê demê, ev kirina ku ji me re fena(wekî)

listekê bû, me nizanî çî birînen xedar di dilê zarokên cîran û birayên me de vedike. Piştî gotina eşhedê ku ji nav lepên me difilitin û bi çend gavan bi dûr diketin, wekî zîpikê kevir li me dibarandin. Û heta ku dengê wan dihat digotin: "Ez fileh!.. Ez file me!.." Dengê vê qêrîn û hawarê digihîşt zîharan û bi dengvedan li me vedigeriya. Ji yê ku me, ew kiribûn misilman, em tenê bi ketina nav lepên wan, bi şîva dara hinarê ya ter, di nav piştî me diketin ku me digot, qey mozên sor ên teinî bi me vedane.

Piştî parlamentoya Fransayê qanûna Tovqelîna (Tevkuştina) Ermeniyân qebûl kir, li Tirkîyeyê her kes rabû ser piyan. Dîsa dest bi înkâr, tîrsfirandin û derewkariyê kirin. Ji rayedarên Fransayê re nota û namê hatin şandin. Li gorî tirkan, li ser bûyerên dirokî ne siyasîmedar, tenê diroknas dikarin biaxivin. Û wê qanûneke wiha, ji terorîzmê re vexwendname (dawetiyê) derxista.

Diroknas, siyasîmedar, nivîskar û rojnamevanên Tirkîyeyê, rast û çep bi yek devî, bîrdoza fermî anîn ser zimên: Ermeniyân îxanet kiribûn û alîkariya artêşa Ûris a dagirker kiribûn. Di ser de jî tevkuştin bi destê ermeniyân hatibû kirin. Di koçberkirina wan de çendek kes, ji wan ji miribûn, ev rast e. Belê ev ne politîkaya dewletê bû, di mercên şerêkî giran de bûyerên wisa dibûn.

Roj tê Komara Tirkîyeyê her tiştên Dewleta Osmanî înkâr dike. Belê dor tê ser pîrsa Ermeniyân û Kurdan dibin agir, dibin şer û

kefa harbûnê bi ser devê wan dikeve. S. Demirel, ji heyetê re wiha got. "Em dizanin rojavayiyên Sewr ji bîr nekirine. Ji Dewleta Osmanî 26 dewlet derketin. Ji van du heb, Ermenî û Kurd nebûn dewlet û nikarin bibin jî." (4. Haz. 98 - Hurriyet) Sedema tovqelîne jî Û ya înkârê jî di van gotinan de weşartî ye.

Li ser biryara Fransa yê Patîrxaneyaya Ermeniyân civîneke çapameniyê li dar xist. Rojnamegerên Tirkîyeyê, berê kamera û objektîfên xwe mîna kaleşnikovan dabûn ser çîgirê patîrk, birêz Mesrop Mûtafyan. Te digot qey dixwaza eşhedê lê dikin. Û Mûtafyan got: "Em biryara Fransayê di cih de nabînin, tu xêr ji tevdana bûyerên dirokî sadir nabe..." Min di çavên birêz Mûtafyan de, hestên zarokên fîllehan ku me ew dikirin misilman dîtin.

Nivîskarê sporê Arman Talay (tu nebêjî Ermeni bû) çû rehetê. Ji dewletê re firsend çêbû û ala Tirkîyeyê, ya bi hîv û stêrk di tabûtê werkirin. Rihetî nedan miriyê fîllehan jî. Di tabûtê de eşhed pê dan xwendin (!) û rojnameya Hüürriyetê nivîsî. "Ala sor û spî ya tabûta Arman Talay nixumandî bû şeqamek û li rûyê Fransayê ket."

Dewlet û gelên dinya demokrat dixwazin Tirkîye tovqelîne qebûl bike û lêborîne bixwaze.

Lêborîna xwestin û li xwe mikur hatin, karê mirovên bi esl in, nişana mezinahî û esaletê ye.

Bila dinya qet li vê nepê. Em hevdu qenc nas dikin.

# Selîmoyê dîn û zebeşên Xwedê

**W** Li Misircê (Qurtalan) ya Sêrtê bi navê Selim Sevda, ku di navgel de wekî "Selîmoyê Dîn" tê nasîn, mirovekî eceb û sosret heye. Temenê wî li dora 40 salî ye û hê jî jiyana xwe li vê navçeyê wekî masqota gel didomîne. Her çiqas jê re dibêjin dîn lê ew bi xwe mirovekî fetbaz, henekok û carna jî diltenik e. Mirovan dibe serkaniyê lê tîne. Rojekê jî rojan Selîmoyê Dîn gazî jina xwe dike û jê re dibêje: "Hermet! were em herin hem ji bo xwe û hem jî ji bo Xwedê zebeşan biçînin, wê gavê wê Xwedê jî xêra xwe li ser me binivîse." Jina wî dibêje: "Baş e!" û diçin nav dehl û rezan. Selîmo tovên zebeşan tîne ku di axê de biçîne. Çiqas erdekî spehî, nerm û xweşik heye dema tov davêje dibêje: "Ev ji bo min", lê çiqas erdekî beredayî ku di nav kevir, şov û tehtan de ye jî dema tov davêje dibêje: "Ev ji bo Xwedê"....Bi vî awayî dom dike: "Ev ji bo min, ev ji bo Xwedê!....."



Çend meh di ser re derbas dibin. Rojekê Selîmo dîsa gazî jina xwe dike û dibêje: "Kezîkurê! De ka rabe em herin, rêwşa zebeşên me û yên Xwedê çi

ye?" Radibin diçin. Diçin lê çi bibînin? Şînahiyek jî di cihê ku ji bo xwe çandîbûn de tune, her der çol û beyar e. Lê

li aliyê din, cihê ku ji bo Xwedê tov avêtibûn nava wan kuç û keviran zebeşên bi qasî serê mirovan çêbibûn. Selî-

mo û jina wî şaş û metel dimînin. Selîmo ji jina xwe re dibêje: "Jinê rabe em vê gavê herin lê divê em bi şev tevî kîsikên xwe werin û zebeşên Xwedê bidîzin." Jinik bi gotina Selîmo dike.

Dibe şev têne nav zebeşên Xwedê û heta ku dikarin zebeşan dixin kîsik û tûrikan. Di wê navberê de pêşî hûrehûr, lê piştî re baraneke zexim li wan dike. Selîmo dibêje: "Jinê! jinê! Bi navê Şêx Hesên, Xwedê bi me hesiya ku em di ziya wî dikin, de ka bi dûvê vî tûriki bigire em birevin!" Dibezin hey dibezin. Lê her çiqas ew dibezin, baran li wan zêde dike, çawa ku tofan rabûbe. Ji dûr ve dibînin ku ronahiya mizgefta gund dibe. Ber bi mizgeftê ve dibezin. Wê gavê teyrok li wan dike. Nêzikî ber mizgeftê bûne. Selîmo dike ku gava xwe ya dawî bavêje nav deriyê mizgeftê, birûskêk şerqînî dike û li ber lingên wî diteqe. Selîmoyê Dîn êdî xwe hew digire, herê xwe ber bi asîmanan ve bilind dike û dibêje:

- Ha gidî ha! Ha gidî ha! Ka tu ji bo zebeşekî mala xwe jî xera nakî?

Berhevkar: Salihê Kevirbirî

## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (125)

## XAÇEPIRSA

Tebîn: Ji ber xelederketina xaçepirsê, me bersiv neweşand.

### Bersiva Xaçepirsa 123'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 125'an pirtûka Ramazanê Botî 'Zargotin e.'

#### Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

WESANA ENSTITUYA KUPDI

Ji ber ku xaçepirsa me ya hejmarê 123'yan ji ber sedemên teknîkî xelet derketibû, bersivên ji me re hatin ji xelet in. Ji ber vê yekê emê xelata vê hejmarê ji bo bersiva hejmarê 125'an dîsa bidin we xwendevanên xwe.

Fektyek Rêveberê KHRP'ê (wêne)	Navekî jînan Çaçax	Baneşane k Notayek	Berbang Berepaşki daçekek	Rîş, kok Strî	Jîrek
				3	1
Nihêrt			Dijberê tîr		
Jêderk					
		2	Tîpa berî F'yê Zîmanê çihûyan	Dawera Nîkelê Xwarîneke btîngêhîn	Dijberê erê
Dijberê tariyê			Dawera Neodimê Navekî jînan		Qertafa neyîniyê
Dawera Hidrojenê					
	Dar û ber	Kek Navekî jînan		Dayîk Baxê ...	
Tîpeke dengdar		Kesên ji Îranê			
Îlac		Notayek			
Pêşgirek				Tîpa piştî P'yê Dijberê nêr	
Kesê avê divê		Mektûb			
		Cinavkeke pîrstiyarî		Xwarina sewalan	

PEYVA VEŞARÎ



# Keyna kurd û vilika Kurdistanî: Sema Yüce bî tewrê qelfeyê şehîdan

Endama PKK Sema Yüce, roja çarşemey Nêweşxaneyê Cerahpaşay de şehîd kewt. Yüce, Girotxaneyê Çanakkale de, roşenê kurdan Newroz de qandê protesto-kerdina zilm û zordrîne dewleta tirk adir dabi ganê xo ya. Yüce hîrê mengî yê, nêweşxanan de tedawî diyê. Keyna kurd Sema Yüce verî Çanakkale ra ard nêweşxaneyê Şişli Etfal û wija ra jî hewadiyê nêweşxaneyê Çapa. Hewna neweşîna ci nêravêrbî ke, dewlet a peyser berd Girotxaneyê Bayrampaşay û nêweşxaneyê nê girotxane de tepişte.

Yüce rojo îne Nêweşxaneyê Cerahpaşay de ameliyat bîbî. La belê rojo çarşeme, şafaq ra dirbeta ci vêşî bî û coka fina hewadiyê serwîsê acil. La belê keyna kurd û vilika Kurdistanî na fin, serwîsê acil-ra weş nevejîyê.

Sema Yüce, sera 1971'ın de şaristanê Tutak de dewa Qerxêlixax Jêrin de maya xo ra biya. Dibistanê verîn, wer-tey û lîse Agirî de, bahdo jî Fakûlteya Sosyoloji yê Zankeyê ODTÜ Anqerî de wendbi. Ay qandê şoreşê şarê xo, no zankeye, di serî tepya, nîmjet verada û sera 1991'ın de şî koyan ser, û a jî zey embazanê xo yê bînan bî gerilayê artêşa reynayîne şarê Kurdistan. Sera 1992'ın de jew lecî de dirbetin kewt destê leşkeranê dewleta Tirk. Yüce endamîna PKK ra 22 serî 6 mengî ceza girot û şeş serî yo Girotxaneyê Çanakkale de girotebî. Şewa 21'ê Adara 1998'î de şewa Newrozî de adir verda ganê xo

"Min waşt ke verpersê jenosîde kurdan û lecê leyminî bida. Qandê politîkanê îxanetey û teslîmetey û bandorkarîna dewletan ganê xo dana adirî."



û xo veşna.

Bahdoyê şahadetê ci, malbata ci-û welatperweran a tenya nêternê û nêweşxanî ver de arêbyay pêser. Zaf rojnamegerî jî kêberê nêweşxanî ver de, qandê xeberê hewadiyayîne meytî pawitê.

Maya Sema Yüce, Zenure Yüce rojnamegerê ke nêweşxanî ver de arêbyay-bî pêser rê wina vat: "Sema min rê vat, 'Eki ez weşîna xo vîni bikera, meytê

min berê welatê min Kurdistan. Min bidê hera Kurdistanî. Şima yê, min ya kalekê kalikê min de, yan jî kalekê hîrê embazanê min gerilan de bidê ax'. Min jî soz da ay. Eza ay, bera welat û kalekê kalikê ci de bida ax. Min tim û tim ay ra rûmet girot. Ez dayik a, ewro bermena, la belê eza ay qe xo vîra nêkera û eza tim û tim ay ra rumet bigîra. Eza ay bêrûmet nêverada, çirê ke a qandê we-

latê xo Kurdistan şehîd kewt".

Hîrê mengî verî Girotxaneyê Çanakkale de verî Sema Yüce, peyra jî Fikrî Baygeldî xo veşnabi. Fikrî Baygeldî vêşî weş nêmend û çend rojî tepya şehîd kewtibi.

Ê rojan de Serokê PKK Abdullah Öcalanî kerdenê Fikrî û Sema wina ard-bi zîwan: "Nê embazan verpersê îxanetey û qetliamanê tirkan ebi ganê xo ya day. Na koteka zaf gird û ebi rûmeta ke gunawo sûretê îxanetey. Ney ra tepya ma yê îxanetey ra vêşerî, qehramanan biyarê çîmanê xo ver û qeraranê xo bidê".

Sema Yüce wexto ke ganê xo dana adirî, jew namê jî xo pey de embazanê xo rê veradana. Na name de wina, "Min waşt ke verpersê jenosîde kurdan û lecê leyminî bida. Qandê politîkanê îxanetey û teslîmetey û bandorkarîna dewletan ganê xo dana adirî. Min no qerar ebi îrada xoya girot". Keyna kurd vilika Kurdistanî 17'ê meng de Nêweşxaneyê Çapa de nefesê xo yo peyîn da û a jî, bî tewrê qelfeyê şehîdanê Kurdistanî.

Şarê kurd meytê Sema Yüce 18'ê meng de slôgananê "Şehîd namirin", Bijî Bijî PKK, ARGK, ERNK", "PKK Şaro, Şaro tiya" û Bijî serok Apo" ya otogarê Esenler ra, rişt Kurdistan û wastena keyna kurd û vilika Kurdistanî ard ca.

A. WELAT/STENBOL

## Sema Yüce



"Di şer de serkeftin!  
Di jiyanê de azadî!"

Evîna te ya mezin,  
di dilê me de pêl dide!

Em li ser soza xwe ne

Em rêwiyê Welatê  
Rojê ne heval!

**Navenda Çanda  
Mezopotamya**

## Sema Yüce

"Ez dixwazim bi canê  
xwe bibim pireke ji  
êgir di navbera 8 û  
21'ê adarê de. Ji bo  
ku ez bibim şagirteke  
baş a Kawayê  
Hemdem û hemû  
şehîdên me yên din, ez  
dixwazim wekî Zekiye  
bişewitim û wekî  
Raşan bibim  
Newroz."

Agirê ku te bi bedena xwe vêxist, riya me ronî dike!

**Xebatkarên  
Azadiya Welat**



## WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

- Xwedî (Imtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN
- Yönetim Yeri  
İstiklal cad. Asmalı  
Mescit sok. 35/37  
No:308  
Beyoğlu/İstanbul  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85
- Berpirsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN
- ÇAPXANE  
Yeni Asya  
Matbaacılık A.Ş.
- Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve  
Yayıncılık San. Tic.  
Ltd. Şti.
- BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım
- NÜNERİTİYEN.ME  
(Temsilciliklerimiz)
- Mürşin  
Tel: 0 (324) 233 83 96
- İzmir  
Tel: 0 (232) 425 37 02
- München:  
(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
- Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815
- Swisre:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07
- Hollanda:  
S. A. Fewzi  
31 104 85 55 43
- Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yûsiv

# Azadiya Welat li Mêrsînê şax veda

# Tim û tim pê nûs nagirî

Rojnameya Azadiya Welat ku ji axînen sedsal berê diherikî û dihat, di sala 1996'an de bi dirûşmeya "Azadiya Welat, Azadiya Zimênê" dest bi weşana xwe kir. Di demeke kin de bi mijarên xwe yên cur bi cur xwe gihand xwendevanên xwe û ji bo wan bû wekî dibistanekê. Azadiya Welat dixwest ku, şagirtên vê dibistanê pir bike û bi vê daxwazê gava xwe ya yekemîn li bajarê Mersînê avêt û nûnergeha xwe ya yekemîn li wir vekir. Ji bo vekirina nûnergehê roja 14'ê pûşperê bi beşdariyê girseyî şahiya pîrozbahiyê hat lidarxistin. Pîrozbahiyê, ji bo şehîdên şoreşê bi deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê dest pê kir û bi axaftina Berpirsiyarê Rojnameyê Seyit Karabaş berdewam kir. Karabaş, di axaftina xwe ya vekirinê de wiha got: "Gelê kurd berî Tevergera Azadiyê, ji hev belawela û bêpergal bû. Li şûna doza azadiyê, şerê navxweyî hebû. Kesên li hemberî dagirkeran kîvroşk bûn, li hemberî gundî û mirovên xwe şer bûn. Lê îro ev rewş guheriye. Ev yek bi xwe re mirovên kurd jî serdanpê diguherîne. Gelê me êdî xwe li gorî pêdiviyên şoreşê saz dike. Dagirker tevî hemû hewldanên xwe jî nikarin rê li ber vê geşedanê bigirin. Vebûna Şaxa Azadiya Welat a Mersînê jî vê rastiyê bi awayekî zelal nîşan dide. Azadiya Welat nixê gelê kurd bi zimanê wî lê vedigerîne. Divê neyê jibîrkirin ku, mala ku Azadiya Welat têkevê, wekî ku bibe xweyî mertaleke ji zirxê li hemberî bîroza dagirkeran. Nûnergeha Azadiya Welat li me gişan pîroz be!"

Tevî ku polîsan xwastin ku astengiyên derxin jî, li derdora 500 kesî beşdarî şahiya vekirina Nûnergeha Azadiya Welat bûn.

## Azadiya Welat dengê ziman û çanda qedexekirî ye

Ji bo pîrozbahiyê ji Kurdistanê, Ewropayê û metropolên Tirkiyeyê gelek peyaman (mesaj) hatin şandin.

## Serokê Yekîtîya Rojnamevanên Kurdistanê (YRK) Cahîr Mervan:

Digel hemû zilm û zorana, 100 saliya Rojnamegeriya gelê kurd hate pîrozkirin. Gelek êşere ye ku rojnamegeriya kurd gihîştîye mistewayeke bilind. Em êkoşna we ya li dijî tunekirina çand û zimanê gelê kurd silav dikin û vekirina Nûnergeha Azadiya Welat a Mersînê pîroz dikin.

## Serokê Çiqî yê HADEP'ê Murat Bozlak:

Rojnameya Azadiya Welat di pîrsigirîka bingehîn a kurdî de ristên girîng hilgirtine û ji bo jî bia erdê derxistina ziman û çanda kurdî û pêşxistina wê alîkariyê mezin pêşkêş kiriye. Em vê xebata we girîng dibînin û we destek dikin. Li

ser navê hevalên xwe yên Girtîgeha Sergirtî ya Haymanayê ez silav û hezkinên xwe ji we re dişînim.

## Endamê PKDW'ê Nejdît Buldan:

Azadiya Welat, di berxwedana çandî de rûmeta têkoşinê ye. Di bin hemû zilm û zordariyan de, li dijî qirkirina spî xebatêke bilind tê meşandin. Bi can, bi xwîn zimanek ji bo welatekî azad tê parastin.



Di pîrozbahiyê vekirina nûnergehê de, sansûra li ser Rojnameya Ü. Gündemê jî hate protestokirin



Ligel rêlibergirtina polîsan nêzî 500 kesî beşdarî di pîrozbahiyê de kirin.

Her rûpeleke çapemeniya kurd, bi xwîna şehîdan tê nivîsîn. Ji ber vê çendê Azadiya Welat kulîlka Welat e. Daxwaza min ew e ku, li welatekî azad bê weşandin.

## Xebatkarên MED TV:

Rojnameya Azadiya Welat dengê zi-

man û çanda qedexekirî ye. Azadiya Welat ji aliyê dîroka çapemeniya kurd ve, xwedî roleke girîng e. Me pir dixwest ku di hewldanên we yên sazîkirina nûnerîtiyên nû de, em bi we re bûna. Lê belê dîrbûna me ji xebatên we, tenê di warê fizîkî de ye û dilê me li gel xebatên we ye.

## Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM):

Zimanê me yê ku di pêvajoya hebûn û nebûnê re derbas bû, di vê qonaxa pêşketin û geşedanê de bi hemû gewşînên xwe yên zimanî ve his û ramana kurdî û kurdûnê ji çavkaniya gel, ber bi sazîbûna rêkûpêk ve tê vedide. Em bi her awayî, bi xurtî piştgiriya vê xizmetê dikin û vebûna Nûnergeha Azadiya Welat li gelê me û li rojnameya me pîroz dikin.

## Rêxistinên Navçe û Navenda Mersînê ya ÖDP'ê:

Em wekî rengêkî ji kulîlka azadî, aşî û biratiyê, vekirina Nûnergeha Azadiya Welat a Mersînê silav dikin, serkeftinan dixwazin.

## Serokê Şaxa HADEP'ê ya Amedê M. Selim Kurbanoglu:

Di vê pêvajoya ku em tê de ne, ji bo pêşketina zimanê kurdî Azadiya Welat karên girîng hilgirtine. Em vê xebata we bi rêz û silav dikin û bi gîrîmahiya Amedê ya jî dil serkeftinan dixwazin.

Herwiha li ser navê Înstîtuya

Qandê bûroyê Mersînî tewrbîyî. Qandê şarî û kêfweşîna akerdî, hirê çehar rojî rawey şiya Mersîn. Şiya ke hedrekarîn bikirî.

La belê eki rastî vaji, min nêşa qe teva jî bikirî. Çimki şarê ma yê ke, peyhesaybî buroyê rojnamiyo Mersîn de abiyeno, cayê bûroy mûsabayî û amayê rojname. Coka ma nêşa vejyimi tever.

## Buroyê vilikan pîroz bo!

Şarî ma rexne kerdê û vatê şima hetanî nika çira bûro nêakerdo. Rast vatê. Eki hetanî nika cayanê winayninan de bûroyê rojnami çinyo, no kemiyinê ma wo, hevêyê herey bo jî ma kemiyinê xo dî û qandê kemiyinê xo werte ra hewadayin giranî da karê xo û bûro abiya. Roja 27'ê meng de İzmir de menga bînde jî Amed de oyo abiyoy.

Şarê ma hem verê akerdî û hem jî akerdî peyra ma tenya nêternay û qandê merasimê akerdî rind û weş ravêrdî, çi ci destra arne, kerd. Saeta ke merasimê akerdî dest pê kerd amorê şelîgî resabi panjsey. Merasim zey merasimanê bînan, ebi deqeyê vindartina rêzgirotin qandê şehîdan dest bi ci kerd û ma şehîdê şoreşî ardi xo vîr. Peyra qiseyê akerdî û mesajana ramit. Xeylê saziyan û kesane namdaran, mesajî rişt bî. La belê wexto ke mesajê MED-TV, PKDW, YRK, Serokê HADEP wanyay, meymanê bedahwetê resmî û sivilî hema vejyay werte û serokê meymananê bêdahwetan ra jew komserî vat: "Eno çiç yo, kamo berpirsiyarê tiyay". Wexto ke ez şiya, komserî het, komiser hend bibi hêrs ke, vat eno çiç yo MED-TV, Murat Bozlak, Yekîtîya Rojnamevanên Kurdistanê, şima rast girêdayeyê PKK'ê yê" û zey nînan xeylê çî ardî zîwan, û peyra wast min bigiro bîncim, senike min qaxida iznî dê komiserî, ey polîsê bînî jî giroti xo hetek û dîrî ra akerdî temaşe kerd. Merasimê akerdî deyr û govendana qediya. Wexto ke merasimê akerdî qediya, zereyê bûroyê rojnami kesî vatê qayê bûroyê rojnamey niyo, bûroyê vilikano. Çimki şarî zereyê rojnami vilikana kerd bi pir. Kerdbi zey bûroyê vilikan. Buroyê vilikan pîroz bo!